
KOVARA WÊJE HUNER Û RAMANÊ A 2 HEFTANE

21 Tîrmeh 2018 Şemî

HEJMAR: 244

# Politik ART




www.arsivakurd.org

## Nemirekî denglidinê

# Evdilmelik Şêx Bekir



Ji objektîfa Bilal Kaplan zarokek li mala xwe li ber derabeyên ber pencerê rûniştiye û ji xwe dipirse ka ew wênegir çi dike.



Rê her îşaret bi serbihuriyekê dikin; ti rêwîtî nîne ku çîrokekê nebêje. Ev mirovê hanê jî wê di dawiya rêwîtiya xwe de çîroka rêwîtiya xwe bibêje.

www.arsivakurd.org

**Herausgeber:** *Medya Presse-und Werbeagentur GmbH* Hans-Böckler-Str. 16 63263 Neu-Isenburg **Geschäftsführer:** Ahmet Yücedağ **Ver. Redakteur:** Özgür Reçberlik **politikart@yeniozgurpolitika.org**

# Nemirekî denglidinê



◗ Yek ji nemirê gelê kurd, bêguman Evdilmelîk Şêx Bekir e, ku ew bêpirole hunermendekî pirhêlî û afirînêr bû. Wî çavê xwe ji mirinê neniqand û bû cangoriyekî gelê xwe. Mirovên wiha jêhatî, piralî, çavnetirs û têkoşer gava ji vê dinyaya gewrik bar dikin û serê xwe datînin ser axa sar, şopên kûr û diyar jî li dû xwe dihêlin.

◗ Kesayeteke pirhêl bû. Bestekar, gotinnivîs, stranbêj, sazbend, wergêr, helbestkar û şêwekar bû. Çawan ku ji çanda kurdî û zargotinê re serdest bû, her wisan ji edebiyata klasîk û ya nûjen a kurdî jî haydar bû. Stranên wekî 'Çawbela' û 'Tellî' li kurmancî wergerandibûn ku di kaseta Kulîlka Azadiyê de hene.



Zana FARQÎNÎ

Nemirî têgiheke gelek girîng e ku nabe para her kesî. Ji lew re, ew ji bo kêm kesan tê bikaranîn. Gotineke pêşiyan a kurdan vê rewşê wiha derdibe: "Ga dimire çerm dimîne, însan dimire nav dimîne." Wateya mayîna nav a li dinê çi ye, mirov çima û çawan nemir dibin, nemirî bi çi pêk tê, çima hin mirov bi rastî nemir dibin..? Pirs dikarin dûvdirêj bibin, lê çendî pirsîn girîng be, bersiva pirsê jî ew çend girîng e.

Mirov bi hilberînên xwe, bi dahênan û vedîtinên xwe, bi huner û qabiliyetên xwe, bi qencî û xizmetên xwe nemir dibin. Navên hinan tenê di dîroka gelê wan de, yên hinan jî di dîroka mirovahiyê de bi tîpên zêrîn tên nivîsandin. Bidestxistina mertebeya nemiriyê jî wisa ne hêsan e. Berdêl pir giran e. Çavê hinekan nabire ku ew di nimêtên dinyewî bibihurin. Ji lew re dinya jî şîrîn e, ruh jî. Îcar xwebexşandina di ber azadî û rizgariya gelê xwe de û têkoşîna ji bo nirxên mirovahiyê, wêrekiyeke nedîtî û nebîna divê. Ji bo kesen wiha, kefen tim di bin çeng de ye.

Yek ji nemirê gelê kurd, bêguman Evdilmelîk Şêx Bekir e, ku ew bêpirole hunermendekî pirhêlî û afirînêr bû. Wî çavê xwe ji mirinê neniqand û bû cangoriyekî gelê xwe ku ez ne şaş bim kêlika gora wî jî ne diyar e. Mirovên wiha jêhatî, piralî, çavnetirs û têkoşer gava ji vê dinyaya gewrik bar dikin û serê xwe datînin ser axa sar, şopên kûr û diyar jî li dû xwe dihêlin.

Melek, ku min pêşî bi navê Şengal ew nas kir, ji bo me berê stranbêj û bestekar bû. Lê piştre gava me bi hev re di Koma Çiya de kar kir, min dît ku ew hem hunermendekî piralî yê jehatî ye hem jî ew kesekî ji aliyê çanda kurdî ve gelek xurt, sihbetxweş, şîrîn, nuktezan û xweşmirov e.

Der barê wî de gelek serpêhatî û bîreweriyên min hene. Di dema xwendekariya xwe ya zanîngehê de min ew nasî. Di çalakiyeke Newrozê de, ku li Zanîngeha Bogaziçiyê pêk hatibû. Piştre ji ber çalakiyên ciwanên unîversîteyî û çalakiyên çandî û hunerî yên li komele û saziyên cur bi cur ên partiyên siyasî yên kurd, em pir rastî hev hatin. Bi vî awayî hevaltî û dostaniya me jî bi pêş ket.

Melek, li Enqereyê, li Zanîngeha Hacettepeyê Fakulteya Bijîşkiyê dixwend. Paşê derbasî Fakulteya Bijîşkiyê ya Çapayê ya Zanîngeha Stenbolê bûbû. Xwendina xwe li wir didomand. Lê gava ku li Enqereyê bû, tevî çend hevalên xwe kaseteke kurdî bi navê 'Kulîlka Azadî'yê derxistibû. Wê çaxê qedexeyeke tund li ser zimanê kurdî hebû. Bi rastî ew xebateke serkeftî bû û ji aliyê muzîkî ve jî berhemeke nû û nûjen bû. Loma vê xebatê bandoreke erênî li muzîkhezên kurdî kiribû. Di nav ciwanên zanîngehî de jî wê deng vedabû. Piştî nasîna me, em bi vê taybetiya wî jî hisiyan.

Destpêka salên 90'î, destpêka serhildanan bû, tevgera azadiyê girseyî dibû. Tesîra serhildanan ne tenê li zanîngehan, li her qadê jiyanê çêdibû. Beşdariyên berfireh li tevgera azadiyê çêdibûn. Sazî û dezgehên kurdan dihatin damezirandin. Di atmosfereke wiha de Koma Çiya jî hat avakirin. Serê pêşî Besê, Genim, Leyla û Yekbûn, Xalo û ez bûm. Paşê Melek jî tevî Komê bû. Di pey re Elî Temel, Celal û her wisan kesên din jî tevî Koma Çiya bûn. Lê hîn Navenda Çandê ya Mezopotamyayê (NÇM) venebûbû. Gava NÇM vebû, Koma Çiya û Koma Serhildan a govendê beşdarî vê saziyê bûn ku di destpêkê de ev her du kom tenê di saziyê de hebûn.

Hîn kaseta pêşîn a Koma Çiya 'Rozerîn' derneketibû. Lê em tevî şev û şahiyan dibûn. Ji komê re eleqeyeke baş û ya karîger hebû. Em beşdarî çalakiyên greva birçîbûnê jî dibûn. Ez hez dikim behsa çalakiyeke wiha bikim ku greva birçîbûnê ji ber qanûnên sansur û sirgunê hatibû destpêkirin. Li rêxistina bajêr a Stenbolê ya HEP (Partiya Keda Gel) çalakiya greva birçîbûnê hebû, ji bo piştvaniyê em jî çûbûn. Te dît wek adet li grevan stran tên gotin û govend tê gerandin. Min û Melek, piştî strîna stranên demê yên naskirî, wekî stranên Hozan Dilgeş ên şoreşgerî û yên folklorîk, bi awayekî spontane avêt ber hev. Bi gotina kurmanciya gewr, em bi bendan çûn hev, ku di heman demê de me ji ber xwe ve gotin li hev dianîn û digotin. Kesên amade yên li wir li me man temaşe. Bejim ji nîv saetê zêdetir em wisan bi îrticalî strîn. Gava em betilîn, ji beşdaran ên ku hatin eniya me paç kirin hebûn û wan ji ber 'vê kurdiya me ya asîmilenebûyî' em pîroz kirin, kêfxweşiya xwe derdibirin.

Evdilmelîk Şêx Bekir, bi navê xwe yê din Melek, beriya ku kaseta Koma Çiya a pêşîn derkeve, bi gotineke din beriya ku em ji bo tomarkirina repertuara xwe bikevin studyoyê, wî biryara xwe dabû ku berê xwe bide cihên azad. Gava wî qada xebata xwe guhartibû, ez ne li Stenbolê bûm. Piştî betlaneya dibistanê, ez vegerîbûm Farqînê. Payizê dema ez hatim Stenbolê, haya min ji vê rewşa wî çêbû. Dilê min kewgirî, çavên min tije bûn. Dev li min negeriya, ez di cihê xwe de sar û mit bûm. Heman tişt di çûna şehîd Elî Temel de li min qewimîn. Wek encam, tercîh a wan e, lê çi heyf ku?!!!

Di kaseta Rozerînê de, dengê Melek cih negirt, lê hem di Rozerînê de hem jî di albûmên din ên Koma Çiya de stranên wî, ku beste û gotin aidî wî ne, cih girtin.

> Kesên wiha ku nirxên moralî yên gelan in, divê nemirîtiya wan tim zindî bê hiştin. Navên wan divê ku li dam û dezgehên çandî û hunerî bên danîn. Wekî gotina pêşiyan a kurdan "Hezkirina dilan di dayîna destan de ye." Eger bi rastî em ji kesên wiha hez bikin, divê em berdêla hezkirina xwe bidin wan.

Me di serî de daxuyandibû ku Melek kesayeteke pirhêl bû. Bestekar, gotinnivîs, stranbêj, sazbend, wergêr, helbestkar û şêwekar bû. Çawan ku ji çanda kurdî û zargotinê re serdest bû, her wisan ji edebiyata klasîk û ya nûjen a kurdî jî haydar bû. Stranên wekî 'Çavbela' û 'Tellî' li kurmancî wergerandibûn ku di kaseta Kulîlka Azadiyê de hene. Me got ku şêwekar bû, ango resam. Tabloyên wî jî hebûn, lê çi bi wan xebatan hat mixabin ez nizanim. Bi min re jî xebateke wî ya pênûsrejiyê heye ku rojekê hema wisan ji nişka ve li min mêzand û bi lez û bez wek karîkatur wêneyê min çêkir. Ez vê yadîgariya wî wek bîbikên çavên xwe hîn jî dihêvişînim.

Divê mirov der barê feraseta wî ya muzîka kurdî de û li ser rengê dengê wî jî çend tiştan bibêje. Ew di warê muzîka kurdî de nûxwaz û nûger bû, ku çavkaniya wî jî muzîka gelêrî ya kurdî bû. Ji vê muzîka wî re mirov dikare bibêje ji aliyê şêweyê ve muzîka kurdî ya nûjen û ji aliyê naverokê ve jî bibêje muzîka şoreşgerî û evînî. Deng jî, dengekî tam dawidî yê stûr û nerm bû ku bi kêm kesan re heye.

Kesên wiha ku nirxên moralî yên gelan in, divê nemirîtiya wan tim zindî bê hiştin. Navên wan divê ku li dam û dezgehên çandî û hunerî bên danîn. Wekî gotina pêşiyan a kurdan "Hezkirina dilan di dayîna destan de ye." Eger bi rastî em ji kesên wiha hez bikin, divê em berdêla hezkirina xwe bidin wan.

Melek, dengê te yê dawidî tim li dinê be û dê di guhên guhdarên muzîka kurdî de jî her olan bide.



www.arsivakurd.org



# Cêwiyê min ê êşê
# Melek
# Şêx Bekir

◆ Zimanekî qedexe, ez û Melek bi dizî fêrî alfabêya wî dibûn. Min pê hestên xwe dinîvisandin û Melek bi wî zimanî distira. Zimanekî wisa ku qedexekirinê hezkirina wî di dil de ji çiya bilintir û ji deryayan mezintir kiribû.


Helîm Yûsîv

Dem di navbera salên 1967 û 1968´an de dihejiya, diçû û dihat. Salek ber bi tariya nemanê ve diçû û yeke din berê xwe dida ronahiya jiyanê. Cih, bajarokekî kevnar, gava Xwedê ew çêkiribû bêhna wî gelekî teng bû û di nav aciziyeke mezin de bû. Ji ber vê, havînan ji bilî toz û xweliyê û rojeke ku serê guriyan dişewitand, zivistanan jî ji bilî herrî û çiravê û sermayeke ku av ji bêvilên mirovan diniqtand, tiştekî din lê tinebû. Navê wî Amûdê bû. Ji bakur ve têlên rêsayî, mayîn û leşkerên Tirkan li ser sînorê wî bûn. Ji rojhilat ve Qamişlo, ji başûr ve Hesekê û ji rojava ve Dirbêsiyê jê re sînor bûn. Her çendî biçûçik û jibîrbûyî xuyanî bike, lê dîsa jî hemû cîhan, bi hemû rengîniya wê, di hundirê axa wî de şax dabû. Ji bo gelek kesên ku li Amûdê dijiyan sînorê cîhanê, sînorên Amûdê bûn. Li vî bajarokî di wê demê destnîşankirî de, min li kêleka Amûdê ji rojhilat ve û Melek li kêleka Amûdê ji rojava ve, me çavên xwe li dinyayê vekirin. Em herdu di temenekî de û zarokên yekbajarî, yekzimanî, yekmiletî û yekêşê bûn.

### Qedexeyê Kurdî bi me şîrîntir dikir

Wisa jî em çûn heman dibistanê, li heman kolanan geriyan, wekî du hevalên biçûk, me ji keçikên ku hevalên hevdu bûn hez dikir. Di ber re jî deryaya êşan ya ku em di nav dilê wê de jidayikbûbûn, zarokatiya me dorpêç kiribû. Ew êş, êşa welatekî dagirkirî, perçekirî, bindest û bêxwedî bû. Êşa welatekî ku qedexekirinê navê wî bi me şêrîntir kiribû. Zimanekî qedexe ez û Melek bi dizî fêrî alfabêya wî dibûn. Min pê hestên xwe dinîvisandin û Melek bi wî zimanî distira. Zimanekî wisa ku qedexekirinê hezkirina wî di dil de ji çiya bilintir û ji deryayan mezintir kiribû. Ez wan kêlîkan ji bîr nakim; yekem pirtûka min a bi wî zimanî kete destê min, hêsir xistin çavê min. Wisa jî her ku Melek stiraneke vî zimanî, kevin ba jî, bi dengê xwe nû digot; pêre çavên wî tije hêsir dibûn.

Mîna pirraniya ciwanên Amûdê, siyaseta Kurdî û karê partiyan yê bi dizî bala min û Melek kişand û em ji hiş û aqil bêhtir bi dilê xwe ketin nav karê siyasî. Em pirr biçûk bûn û me karê mezinan dabû ber xwe. Lê dîsa jî karê ku wê demê li rojavayê Kurdistanê dibû, bêhna Melek dernedixist.

### Bi civînan dagir nebûye, rizgar jî nabe

Lidarxistina civînan û danûstendinên li paş perdeyan û di nav çar dîwaran de, herwisa xwendin û belavkirina belavokên siyasî bêhna wî dernedixist û herdem ji rewşê nerazîbû. Dixwest em hin karên mezin bikin. Baweriya wî ew bû ku welat ne bi civînan û ne jî bi belavokan û axavtinên siyasî hatiye dagirkirin, ji ber vê ewê bi civîn û belavok û axavtinên siyasî rizgar nebe. Welatê ku bi zorê, bi hêzê hatiye dagirkirin, divê zor û hêz wî rizgar bike. Herdem bi acizî digot:

- Ji bilî vê xwexapandin e. Aciziya min jî ji vê yekê tê, ku em hemû bi vê rastiyê dizanin, lê kesek wêrekiyê nake û xwe nade ber vî barî.

### Duriyana ji bo xwendina zanîngehê

Salê dida pey salê, me zarokatî li pey xwe hişt û em bûn xwendevanên lîseyê, bekelorya. Piştî wê jî ji ber tinebûna zanîngehan li Amûdê, wisa jî li Qamişloyê, divabû ji bo xwendinê yan em herin Helebê yan jî Şamê. Sal bi ser 1986´an ket û em "xortên Amûdê" wekî ku me nav li xwe dikir, bûn mîna "noka ku tu li kevir bixînî", em belawela bûn. Ji bo xwendina mafnasiyê, hiqûqê, ez çûm Helebê. Lê berê Melek ne li Şamê û ne jî li Helebê bû:

- Ezê herim Stenbolê bixwînim.

Ji nişkê ve Melek ev biryar dabû. Digot ew biryara malbata wî ye û li Serxetê hin merivên wî hene ku wê alîkariya wî bikin. Di wê navberê re, çend caran min Melek li Amûdê dît. Ez ji Helebê vedigeriyam, ew jî ji Stenbolê.

◆ Min li kêleka Amûdê ji rojhilat ve û Melek li kêleka Amûdê ji rojava ve, me çavên xwe li dinyayê vekirin. Em herdu di temenekî de û zarokên yekbajarî, yekzimanî, yekmiletî û yekêşê bûn.

◆ Baweriya wî ew bû ku welat ne bi civînan û ne jî bi belavokan û axavtinên siyasî hatiye dagirkirin, ji ber vê ewê bi civîn û belavok û axavtinên siyasî rizgar nebe.

### Ez nema vedigerim

Cara yekem Melek bi germî behsa çalakiyên xwendekaran yên zanîngehên Tirkiyê ku li dijî faşîzmê lidardiketin, dikir. Behsa girtina xwe ya ji hêla polîsên Tirk ve dikir û nedixwest malbata wî van agahiyan bizanibe. Wisa jî li hember merivên xwe yên li Bakur bi hêrs bû û behsa çûna wan a li ber pêla bişaftinê dikir. Wisa jî behsa damezrandina komên muzîka Kurdî dikir. Cara din, min jê xwest ku piştî qedandina xwendinê vegere Binxetê. Melek bi yek hevokê xwesteka min red kir:

- Ez nema vedigerim vir. Ezê vegerim çi bikim?
- Veger nav me. Em çi dikin tu jî wê bike.
- Hûn rûniştîne, mêşan diqewirînin.
- Tu jî were alîkariya me bike û alî me mêşan biqewirîn.


Ev diyaloga me ya cidî bi vê henekê bi dawî bû. Melek soza xwe bi cih anî. Ew çû û nema li me vegeriya, em jî li cihê xwe man û me mêş qewirandin û hey qewirandin, lê ew nediqediyan.

Dîsa sal derbas bûn. Ez ber bi bayê derbideriyê ketim û bûm penaber, Melek ber bi bayê xweşikbûnê ket û bû şehîd. Ez mezin bûm û va ye hêdî hêdî kal dibim û Melek ciwan ma.

www.arsivakurd.org

# Ji Nisêbînê efsaneyek Hozan Kilamedîn

● Ez biribûm qereqolê û dawet wilo mabû li meydanê. Wele min dî Elîk hat ez jî li hundirê qereqolê bûm. Go, rabe derkeve. Min go, yaw ma dihêlin ez derkevim. Wele mi dî, pasek li derî xist, kete hindirû. Go, yaw hûn çilo hozanê me digirin. Ma qey hûnê zimanê me jêkin!


Argeş KEHNÎHEJÎRÎ

Herçî Nisêbîn e, bi xweragirî û renginiya berxwedana li dijî dagirkeriyê bi nav û deng e. Ev yek helbet nîşaneye hevgirtina xelkê li bajêr e. Ji ber jîngeheke pirr ne mezin e, mirov dikare kodên vê civakbûnê bi hesanî ji raboriya xwe yan jî ji kesên li bajêr gihayî, vereşîne. Civakbûna çak bivênevê weke kodekê bi xwe re raboriyeke hevbeş diafirîne. Hevbeşî jixwe hacet bi pênasekirinê nîne. Lê gava mirov tişteke hevbeş a rabirdûyê texeyul dike, ji bîranînên şexsê xwe dest pê dike. Carinan ez ji xwe re li ser van kodên hevbeş ên xelkê Nisêbînê difikirim ka çiyê kevz negirtî li bîra min e. Bi vê re gelekî li stranbêjên dawetên li kolanên qîrnekirî yên di salên 2000'î de rast têm. Nexasim jî yekî ji kezaba Nisêbînê tê bîra min. Hozan Kilamedîn. Efsaneyeke Nisêbînê. Helbet ew ne tenê sazbendê salên 2000'î ye, lê belê beriya salên 80'yî jî ew her, di destê wî de tembûra wî li dawet û xêlan bûye. Gava ez kesên ji Nisêbînê dibînim, raste rast çêl li Hozan Kilamedîn dikim ji wan re û dibînim ku Hozan Kilamedîn yek ji van kodên têsîrker ê di nava raboriya me ya hevbeş de li cihekî şênber lûsiye. Lewre, ew yek ji wan kesên li heman mekanî ye ku ji me re bûye cihê rêvekirina li ber sohbeteke ji bo hevgirtineke qewîntir.

**Di navbera berê û îro de leylanek**

Li wan dawetên hîn di nav çar dîwarên salonan de nefetisî, hozan Kilamedîn hema hema li her dawetê sazbend bû. Ew li pişt cihazên xwe, dest bi saz, li kêlekê teblikvanek ji bo xêlvanî û govendkêşan bi awaz bû. Helbet dawetên hingî ji yên roja îro bêhtir tehb divîn, pêwîst bû mirov pî li axê bixista, li bin tavê govend bigeranda. Wî heqê wêqas kêferatê dida. Stran digotin, bi behs evîn. Şabaşî didan, xemrevîn. Diqîriya, li zaran miqate bin. Behsa Keçika Nisêbînê ji me re dikir, strana çaxekî li ser zimanan. Hinan diçû yekî din dikir, ewî çêl li wan xayînan dikir. Gava behs dibû dawet, xelkê wesfê xwe dida ku wê wî bînin ji bo daweta xwe.

Hozan Kilamedîn bi navê xwe yê xelkê behs dikir, Kilamedîno. Pirranî wî li dawetan cihê kolika sazbendan nedida kesî. Lê bi çerxa zemên re êdî xelkê berê xwe da komên nû, lewre popûlerîteya Kilamedîno hinekî kêm bû.

*Keçika Nisêbînê pirr bi nav û deng e*
*Dilê min ketiyê li ser serê min ceng e*
*Min dî ji wê de tê*
*We'z çûm pêşiya wê*
*Bi dîtinek tenê*
*Min dil dabû wê*

Hozan Kilamedîn bi eslê xwe ji gundê Şikefta yê Kerboran a Mêrdînê ye. Lê bavûkalên wî beriya bi 70 salî li Nisêbînê bi cih bûne. Ji malbateke sazbend e. Ew, çaxê hîn zarok e, ji bavê xwe fêrî sazê dibe. Di 15 saliya xwe de êdî bi tena serê xwe diçe li dawetan stranan dibêje. Niha 56 salî ye û ev 12 sal in ji Nisêbînê bar kiriye, li Stenbolê bi cih bûye.

Xweş tê bîra min gava digotin, Kilamedîno anîne dawetê, me dest ji diziya hinaran berdida û em diçûn da ku lê guhdarî bikin. Hingî ez zarok bûm lewma min xwe dida kêleka cihazên wî û xwe bi dengê wî re berdida. Wî bi hemû laşê xwe distira. Bi çav, lêv dest, ling û serê xwe... Pêşî bi xwe hîs dikir, paşê ew hîs li me belav dikir. Pirr xweş bû bi zindî, li ber tîna bayêkî hînik guhdarîkirina li wî. Û ew dest hejîna wî çiqas lê dihat.

Beriya bi çendekê dîsa wisa ji nişka ve kete bîra min û min telefonî wî kir, me hinek sohbet kir.

**Ne yek û du 13 kaset**

Ew xwediyê 13 kasetan e. Hin ji wan 13, hin 17 stranan dihewînin. Gotinên gelekan ji wan jî yên wî bi xwe ne. Helbet derfetên wî wan çaxan kêm bûn. Hetta bi nanoziko bûye şahiya dawetan. Lê xwe ji çêkirina videoklîban nehiştiye. Çendek kilîbên wî jî hene ku bi tena serê xwe bi heft zor û bela wî ew kişandine. Di van de mirov wî li nav erdekî pembû bi tevrikvanan re dibîne. Li ber ava Dicleyê stû bi kefî dibîne. Ez ê niha dorê bidime wî û bila ew ya xwe bibêje:

*"Me ne bi serê xwe dest pê kir, ji bav û kalan tê. Ev karê me bû. Her malê îdara xwe pê dikir. Yanî ne go ji ber kêfekê, eşqekê. Zêdeyî 40 salî ye ku ez vî karî dikim. Çavên me di nav vî karî de vebûn. Wan çaxan ez û rehmetiyê Zeynî Koro hebûn. Ew diçû dawetên Ereban. Em jî diçûn yên Kurmancan. Di wê atmosfera hingî de tiştekî milet xwe pê mijûl bike nebû. Ne konser, dawet hebûn lewma bitûnê bajêr ji xwe re lê diciviya. Vêca niha qiymetê wê jî nemaye. Nihakê, tenê stranên evîniyê em karin bibêjin, yê din qedexe ne."*

**Yaw îmkan tine bûn**

Herçî ew klîbên wî ne, ew galegala xwe li ser wan wiha dewam dike: *"Yaw îmkan tine bûn. Heta me ew kişandin, mala me xera dibû. Divê te kamerayeciyek û erebeyek kirê bikira. Hinek hevalan alîkariya me dikir. Yanî wî hesabî bike xwarzê, me her tişt hazir dikir. Her tişt lê carinan teyb tine bû ku em qeyd bikin."*

**Dawet, Kurmancî û zilma dewleta Tirk**

Bi bext reşiya Kurdbûna xwe ew yekî ji me ye. Ji ber ku bi Kurdî gotiye, ma Roma Reş disekine, li wî dibihure! Na helbet. Gelek tehde lê kirine. Gava min jê pirsî ka serboriyeke nexweş li cem te heye. Bi israr digot: *"Erê gelek tehde li ser me hebû, lê, de ka dev ji wan berde xwarzê."*

Bi awayekî wisa digot, mirov digot qey dibêje, ma ne em Kurd in, heqê me ye tehdê li me bikin. Lê hew xwe li ber inyada min girt û got, *"5 salan li min dawet qedexe kirin. Di salên 80yî de nehiştin bi Kurmancî bibêjim. Gelek caran di dawetan de şeqam diavêtin min, tif dikirine min, ez dibirime qereqolê. Rojekê, em li pişt xaniyê Elîkê Betê, me li dawetê dida. Polîs hatin û ez birim. Bi qasî tê bîra min reîstiya belediyê di destê wan de bû. (Behsa cûntaya leşkerî ya 80'yî dike) Ez biribûm qereqolê û dawet wilo mabû li meydanê. Wele min dî Elîk hat ez jî li hundirê qereqolê bûm. Go, tu çi dikî li vir. Min go, ez girtî me xalo. Go, rabe derkeve. Min go, yaw derkeve, ma dihêlin ez derkevim. Go, ka deriyê amir kîjan e? Mi go ez dibê qey ha evê ha ye. Wele mi dî, pasek li derî xist, kete hindirû. Bi wa de kire qerebalix, go, yaw hûn çilo hozanê me digirin. Ma qey hûnê zimanê me jêkin. Û rahişte destê min, bêyî izna wa, careke din ez anîm dawetê. Zilmiya wilo gelekî li me kirin."*

*Mi dilê xwe da te*
*Mi li ber te tobe kir*
*Te digo ez ya te me*
*Te çû yekî xwe kir*
*Hey gidî xayînê dosta yekî diyê*
*Bêbext xayînê dosta yekî diyê*
*Yarê ji min xeyidî naşîne silava*

**Me jî dixwest ji mezinan fêr bibin**

Gava mirov bengiyê tiştekî be tebat bi mirov nakeve. Heman tişt hatiye serê Kilamedîno jî. Wî ji ber kasetên bi Kurdî peyda bike, lê daye çûye Başûr: *"Me ji Kurdistana Iraqê kaset dianîn. Bi mehan nedihatin. Hinek di rêyan de xera dibûn. Kaseteke Tehsîn Teha jî hebû bi min re. Ez çûme Iraqê min ji wir gelek kaset anîn. Min beriya hingî di radyoyê de li wî guhdarî kiribû. Di radyoya Bexdayê û ya Êrîwanê de. Me ji xwe re li malê li wan dihisand, xweş bû, tiştek nebû. Me dixwest, em jî ji wanê mezin bielimin.*

Ev 12 sal in ji bo ku debara xwe bike li Stenbolê dimîne. Hejmareke baş ya kesên ji Nisêbîne, li cihê lê dimîne, heye. *"Miletê me hi´j me dike, qiymet dide me. Me jî xerabiyek li hember wan nekir.*


*Wek zemanê berê em ji xwe re li wan sikakan bûn. Berê meydan vekiribûn, xweş bû, milet kêfa xwe dikir. Hingî milet dihat carina xwediyê dawetan digot ka bibêje herçî nexwestiye bila newê. Niha ne ewqasî xweş e. Lê heta ez karim, ezê herim daweta."*



www.arsivakurd.org

Di navbera bîr û jibîrkirinê de avakirina netewe û çêkirina qehremanan

# Me tu ji bîr kirî Me tu bi bîr anî





Gava em berê xwe didin pêvajoya avakirina neteweyê Kurd, em dibînin ku ji fîgurên dîrokî yên mîna Selahedînê Eyûbî qehremanên avaker nehatine avakirin, li şûna wê ew weke antî-qehreman hatine sêwirandin. Tevî ku fikr û hizrên cihê jî hene gotara giştî serwer, wî bêhtir weke antî-qehreman ava dike.



Luqman GULDIVÊ

Bîra şexsî û bîra komî, civakî yan jî kolektîf, xwedî hin xislet û tevgerên mîna hev in, yan jî hev bi bîra me dixin. Mirov jiyanekê dijî, lê jiyaneke bi temamî û her kêlî di bîra wî de nîne, jixwe herçî hizra mirovî ye, di wê de gelek kêm tişt hene. Bi her halî em îro di encama lêkolîn û tecrûbeyên sedan salan xwediyê wê zanînê ne ku hem di avakirina nasnameyên şexsî û hem jî di avakirina nasnameyên komî de bîr xwedî dewreke diyarker e. Heta heger mirov bêhtir bide nav dikare bi hêsanî bibêje avaker bi xwe, bi rengekî ji rengan bîr e. Hem bîra şexsî û hem jî bîra komî di avakirina nasnameyên cihê de xwe tenê nasipêre tecrûbeyên ferdekî yan jî yên komekê yekser. Ev bîra hanê, dikare bîra vegotina endamên malbatê, yên civakê, yên sîstema perwerdeyê, yên komên û civakên cihê be. Ango di rastiyê de bîra encama gotarên cihê be jî. Li vir ez naxwazim zêde bidim nav vê mijarê, û meseleyê li hev biherbilînim, ez ê tercîh bikim, balê bikişînim ser aliyê bîrê yê ku xwe disipêre ser aspekta jibîrkirinê; jixwe em xwe lê daneynin jî, em hemû pê dizanin ku her tişta li bîra me, îşaret bi gelek tiştên jibîrbûyî dike. Bivênevê, di meseleya bîrê de em bi jibîrkirinê re rûbirû dibin. Ev qaîde ji bo kom û civakan jî lê ye.

Heger behsa me jî li ser bîrê be, em di heman demê de behsa amneziya (bîrokebûnê) jî dikin. Bîr, weke avakera nasnameyên ferdî û komî li vir vediguhere bîreke ku bi tercîhan tê avakirin. Bîra ku bi tercîhan tê avakirin jî ew e ku mirov tecrûbeyên ferdî û civakî, dîsa tecrûbeyên bi vegotinan ragihandî (yên nifşên beriya niha, yên nas û xizman, yên heval, dost, dijmin û kes û kusan) û wekî din "tecrûbeyên" çêkirî yên texeyûla komeke civakî ya taybet (malbat, bavik, eşîr, milet, netewe û wekî din) li parzûnekê dixe û yên ku di wê parzûnê re derbas dibin tê de bi cih dike. Mirov dikare li vir îdîa bike ku ya tê tercîhkirin ne ya ku wê bê bibîranîn e, lê ya ku wê bê jibîrkirin e. Ji ber vê yekê jî zehmet e mirov bibîranîn û jibîrkirinê ji hev bike; lewma herdu jî di zik hev de di nava heman pêvajoyê de hemwext diqewimin.

**Avakerên netewe bîrê ava dikin**

Di pêvajoyên avakirina netewe de jî ev çerxên avakirina bîrê (yan jî çerxên kewara jibîrkiriyan) diyarker in. Ji bilî mîtên avaker ên neteweyan, ku dikarin bi temamî çêkirî bin yan jî ji mubalexekirin yan jî zêde dramatîzekirina qewmînên bi rastî pêk tên, gelek mîtên ji bo sedem û armancên cihê jî hene ku di nava bîra kolektîf a neteweyî de di çarçoveya avakirina netewe (her wiha ji nû ve avakina wê) de bi dewra xwe radibin. Dîrok, efsane û destanên gelerî ji bo van kewareke baş in ku ava-kerên neteweyan dikarin jê ji xwe re wan mîtên bikêrhatî vejêrin. Ji bo minaqeşeyeke berfireh, ya baş ew e ku em li vir berhemên Anthony D. Smith yên li ser netewe û avakirina wê (National Identity, 1991; Myths and Memories, 1999; Ethno Symbolism and Nationalism: A Cultural Approach, 2009 û yên din) û pirtûka Benedict Anderson a bi navê Imagining Comunities (Texeyulkirina Civakan) salox bidin û berê xwe bidin meseleya xwe.

Qehremanên neteweyî (malbatî, bavikî, eşîrî, qewmî, milî jî) beşeke girîng in ji wan mîtên ku nasnameya neteweyî ava dikin yan jî dewamîbûna wê misoger dikin, bi rengekî ji rengan wê her ji nû ve ava dike. Ev qehreman dikarin ji bo tevahiya netewe bi tesîr bin, dikarin ji bo seferberkirina beşek ji netewe ji bo mijarên diyar bi kêr werin, dikarin ji bo hestên aîdiyetê li cem hin komên netewe yan jî tevahiya netewe peyde bikin; bi her halî ew bi pirranî bi tercîha tevgera/ên siyasî yên pêşeng ên neteweyî hem di dema avakirinê de û hem jî di demên paşê de tên tercîhkirin, gotarên wan tên avakirin û di nava civakê de û bîra civakî de cihê xwe digirin.

Li vir divê em bibêjin ku hin qehremanên neteweyî ji ber hin xisletên di nava civakê de dikarin ewqasî belav bibin ku bivênevê avakerên netewe yan jî veavakerên wê neçar gotarên wan jî li gotarên xwe zêde bikin ji bo ku hêsanîtir hisa kolektîfbûnê bi endamên wî neteweyî re çêkin ku tê avakirin yan jî veavakirin.

**Ji mîtên, tecrûbeyên dîrokî û têkoşîna yekser dawerivandin**

Li vir dema em berê xwe didinê, di asta yekem de qehremanên mîtên kevin ên civakî tên tercîhkirin. Ev qehreman ji nû ve tên avakirin û bîra kolektîfbûna wan û sembolîzma wan jî ji nû ve tê avakirin.

Dema ev tê kirin gelek qehremanên din tên tinekirin, jibîrkirin yan jî jêbirin. Di dema serdemên avaker ên civakî de û nexasim jî li vir jî ber ku em behsa netewe dikin, di dema yên neteweyî de hin mirovên pêşeng hene ku hem ji bo tevgera siyasî ya rizgarker yan jî ji bo netewe avaker, dikare bi bibîranîna wan pêşengên neteweyî yan jî hin beşên neteweyî ji bo sedem û armancên cihê seferber bike. Ev jî tercîha avakirina bîrê ye ku wê tevahiya "qehremanên" wî neteweyî nehewîne, lê cih bide hinan jî bo sedemên seferberkirinên civakî û siyasî.

**Di pêvajoya avakirin û veavakirina netewe de çi diguhere**

Gava em berê xwe didin pêvajoya avakirina neteweyê Kurd, em dibînin ku ji fîgurên dîrokî yên mîna Selahedînê Eyûbî qehremanên avaker nehatine avakirin, li şûna wê ew weke antî-qehreman hatine sêwirandin. Tevî ku fikr û hizrên cihê jî hene gotara giştî serwer, wî bêhtir weke antî-qehreman ava dike. Em li vir bibêjin, di pêvajoya avakirin û veavakirina netewe de ev yek dikare biguhere û ji vî fîgurê dîrokî qehremanekî serfiraziya neteweyî jî bê avakirin. Dîsa di peywenda Kurd de fîgurê mîtolojîk ê Kawayê Hesinkar avaker hatiye tercîhkirin û ew di nava peywendeke dîrokî de jî hatiye bicihkirin; ango ew ne tenê fîgurê mîtolojîk ê serdema mîtolojîk a Cemşîd e, lê ew fîgurekî dîrokî ye ku serketina eskerî ya Medan li dijî Împaratoriya Asûriyan misoger kiriye.

**Weke kirdeya bi tesîr a avakirina bîreke kolektîf; PKK**

Herçî peywenda Tevgera Azadiya Kurd e; bi awayekî bi tesîr avakirina lehengan, avakirina sembolên neteweyî û avakirina bîreke kolektîf a avaker bêhtir bi PKK'ê û nexasim jî piştî nîvê salên 80'yî derket pêş. Hem sembolên mîna ala, reng, vegotinên mîtolojîk, hem qehremaniyên têkoşînê yên mîna Berxwedana Zindanan (14 Tîrmehê), û her weha lehengên wê bi xwe yên weke Mazlûm Dogan (weke Kawayê Hevçerx) û gelekên din ji serketinên sereke yên vegotina îdeolojîk û avaker ên PKK'ê ne ku hîna piştî salên 2000'î li nava hizb û rêxistinên Kurd ên din de jî hêdî hêdî rûnişt. Di nava vê rêûresma PKK'ê ya avakirina sembol, gotar û qehremanên neteweyî de û pê re jî di vehûnandina bîreke (jibîrkirineke) tercîhkirî de îro em bi gelek sedem û armancên bibîranînên cihê yên bûyer û qehremanan re rûbirû ne ku tevahiya salekê ji bi minasebetên cihê tijî dikin û bi kêra seferberiya civakî û siyasî ya "netewe" tên. Jixwe, PKK dema ku xwe weke "tevgera şehîdan" bi nav dike jî eşkere îşaret bi wê yekê dike ku ew bi zanîn û bîrewerî van sembol, kult, rêûresm û lehengan ava dike.

**Ew ê paşê neyê `vedîtin´?**

Ji bilî jibîrkirinê, di bibîranîna kes û qehremanan de karîgeriya paşiyan jî girîng e. Heger paşiyên kesekê/î, "qehremanekê/î" bi kêra avakirina gotara qehremankirina wê/wî neyên, ew kes yan jî qehreman mehkûmê jibîrkirinê ye. Lê maneya wê ne ew e ku ew ê paşê neyê "vedîtin". Hincetên vedîtinê dikarin derkevin holê, bibîranîn derengmayî dikarin bibin sedema avakirina qehremaniyeke xurttir jî. Nexasim heger beşeke netewe, yan jî beşeke çerxa avakirina netewe vê yekê pêwîst bike, yan jî kêmasiyeke taybet vê yekê pêwîst bike, bi hêsanî gotarên avakirina qehremanekê/î dikarin derkevin meydanê.

Herçî peywenda Tevgera Azadiya Kurd e; bi awayekî bi tesîr avakirina lehengan, avakirina sembolên neteweyî û avakirina bîreke kolektîf a avaker bêhtir bi PKK'ê û nexasim jî piştî nîvê salên 80'yî derket pêş. Hem sembolên mîna ala, reng, vegotinên mîtolojîk, hem qehremaniyên têkoşînê yên mîna Berxwedana Zindanan (14 Tîrmehê), û her weha lehengên wê bi xwe yên weke Mazlûm Dogan (weke Kawayê Hevçerx) û gelekên din ji serketinên sereke yên vegotina îdeolojîk û avaker ên PKK'ê ne ku hîna piştî salên 2000'î li nava hizb û rêxistinên Kurd ên din de jî hêdî hêdî rûnişt.

www.arsivakurd.org

**Dema ku berê xwe bidin nimûneyeke taybet, em dikarin di şexsê Evdilmelik Şêx Bekir ê bi navê Melek navdar de tercîhkirina avakirina qehremanan hêsantir fêm bikin û bibînin ka gelo muhtemel e çi bûbe xwedî dewr ku ew bê bibîranîn yan jî jibîrkirin.**






### Me çima Melek ji bîr kir

Dema ku berê xwe bidin nimûneyeke taybet, em dikarin di şexsê Evdilmelik Şêx Bekir ê bi navê Melek navdar de tercîhkirina avakirina qehremanan hêsantir fêm bikin û bibînin ka gelo muhtemel e çi bûbe xwedî dewr ku ew bê bibîranîn yan jî jibîrkirin. Evdilmelik Şêx Bekir Nîsana sala 1992'yan weke gerîlayekî ARGK'ê şer kiriye, di şer de bi birîndarî ketiye destê cerdevanan û hatiye qetilkirin; ev agahiyên ku Serxwebûnê li ser wî dane. Ew yek ji xwendekarên tibê yên salên 90'î ê li metropolên Tirkiyeyê ye; pêşî li Enqere û paşê jî li Stenbolê. Ji bilî xwendekariya xwe, ew hunermendek e ku hem dengê wî taybet e, hem bestekar e, hem helbestkar e, hem aranjor e û hem jî solîst e. Di dema qedexebûna zimanê Kurdî de wî di ew di derxistina kaseta Kulîlka Azadî de bi dewra herî mezin rabû û ji damezrênerê NÇM'yê ye jî. Ango tevahiya peywenda jiyan, xislet, şarezatî û heta bi têkoşîn û şehadeta wî îşaret bi lehengekî dikin.

### Avakirina lehengekî di şexsê Melek de

Lê çawa di destpêka vê gotarê de jî min îşaret pê kir, meseleya lehengbûnê û avakirina leheng ne heman tişt e. Di nimûneya Selahedînê Eyûbî de me dît ku xeta di navbera qehreman û antî-qehreman de jî pirr zirav e û dikare ewqasî zelûl bibe ku xuya neke. Ji ber wê jî lehengbûna Melek û avakirina lehengekî di şexsê Melek de di tiştên bi temamî ji hev cihê ne. Gava ku em li navên beriya wî şehîdbûyî yên ji tevgera çandê ya Tevgera Azadiya Kurd ên weke Hozan Mizgîn dinihêrin em dibînin ku heta îsal jî bi rêkûpêk ji aliyên hunermendên Kurd ve, Tevgera Azadiyê û saziyên wê ve bi minasebetên cihê tên bibîranîn. Baş e sedem çi ye ku Melek 'kêm' tê bibîranîn?

### Rola hevrêyên wî çi bûye?

Ji bo vê em berê xwe bidin cihêtiyên di navbera Hozan Mizgîn û Melek de; Yek jê li Ewrûpayê di nava tevgerê de cihê xwe girtiye, yê din li metropolên Tirkiyeyê. Yek jê ji Bakurê Kurdistanê ye, yê din ji Rojava. Yek jê demeke têra xwe dirêj di nav gerîla de cihê xwe girt, heta bû fermandar, yê din piştî demeke kurt şehîd bû. Herdu jî ji nifşên wisa ne ku gelek hevalên wan hene ku îro di nava civaka Kurd de tên nasîn û gotina wan tê bihîstin, lê yê yekî ji wan bi pirranî ji Rojavayê Kurdistanê ne. Ev cihêtiyên hanê dikarin çi tesîran li bibîranîn û jibîrkirinê bikin? Li Ewrûpayê Tevgera Rizgariya Kurdistanê nisbet bi Tirkiyeyê xwedî derfetên bêhtir ên xebata rêxistinî bû û hîna jî nisbeten wisa ye. Nexasim jî navendên ragihandin û propagandaya rêxistinî, avakirin û hilberînên îdeolojîk û çandî jî li Ewrûpayê bûn. Ji ber vê yekê jî mirov dikare bi hêsanî texeyul bike ku dema Hozan Mizgîn Şehîd bû, hevalên wê yên di nava tevgera çandê ya hingê de beriya her tiştî ew bi bîr anîn û ji bo vê jî derfetên wan ên mîna belavkirina kasetên vîdeo, kasetên deng, weşanên cihê, lidarxistina konseran û çalakiyên cihê ji bo bibîranîna wê bûn. Li beramberî vê di nava şertên gelekî dijwar û qedexeyan de li bakurê Kurdistanê û metropolên Tirkiyeyê destpêka salên 90'î rêxistinkirina çandî û avakirina saziyên çandî pêk dihat. Derfetên weşanê û propagandayê hem sînordar bûn û hem jî nîrê sansûreke giran li ser hebû. Bi ser halan de jî Melek weke Şengal di nava damezrênerên NÇM'ê de cihê xwe girtibû û weke Dr. Cuma şehîd bûbû. Cihêtiya sêyem ango, dirêjahiya wê demê ye ku di nava gerîla de derbas kirine. Hozan Mizgîn beriya her tiştî jî weke fermandara gerîla tê bibîranîn, bi gotinên Komîteya Kevana Zêrîn a îsal "Kesayetiya Hevrê Mizgîn a pirralî, hevgir û hunermend, aliyê dibe destan ê jinên Kurd îfade dike" û bi bîr dixe ku ew yekem fermandara jin a gerîla ya eyaletê bûye li Xerza û Gulana 1992'yan fedaiyane şer kiriye û şehîd bûye. Lê paşxaneke bi vî rengî ya Melek nîne, belê ew jî fedaîyane şer dike, hevalên bi xwe re rizgar dike û bi birîndarî dîl dikeve destê dijminê xwe û tê qetilkirin.

Yek jê li Ewrûpayê di nava tevgerê de cihê xwe girtiye, yê din li metropolên Tirkiyeyê. Yek jê ji Bakurê Kurdistanê ye, yê din ji Rojava. Yek jê demeke têra xwe dirêj di nav gerîla de cihê xwe girt, heta bû fermandar, yê din piştî demeke kurt şehîd bû. Herdu jî ji nifşên wisa ne ku gelek hevalên wan hene ku îro di nava civaka Kurd de tên nasîn û gotina wan tê bihîstin, lê yê yekî ji wan bi pirranî ji Rojavayê Kurdistanê ne.

### Sebeb kî ne

Lê bi ya min sedema diyarker di tercîhkirina bibîranîn û jibîrkirinê de di rewşa melek de ew kirde ne ku wê bîrê yan jî tişta ku wê di bîrê de cihê xwe bigire ava bikin. Ango cihêtiya dawî ye: ne nebûna paşiyan ku karibin behsa wan bikin, lê bi karîgerî û bi bîrewerî hewldana avakirina bibîranîna wan di pêvajoya çêkirina qehremanekî de. Li vir hem damezrînerên NÇM'ê hem endamên destpêkê yên Koma Amed a li Enqerê, hem jî hevalên zaroktî û ciwantiyê yên Melek diyarker in bi wê yekê ku wan nekarî gotareke avaker belav bikin.

www.arsivakurd.org

# Jibîrkirina Evdilmelik weke xwerexnekirinekê



Dengê wî xurt bû, bas barîton bû. Dixwest karê xwe yê muzîkê bi pêş ve bibe, jixwe, di nav NÇMê de ji bo vê cih girtîbû. Berî her tiştî welatparêz bû û dil dabû Tevgera Azadiyê.



İbrahim BULAK

Evdilmelik Şêx Bekir ê ji Amûdê ku li paytexta Tirkiyeyê Enqerê tib dixwend, hiingê bi navê Koma Amed kasetek derxistibû û piştî hingê di nava damezrandina NÇM'a Stenbolê de cihê xwe girt. Hunermend Rotînda jî ku di nava damezrênerên NÇM'ê de hem hingî, û hem jî xurtiya dengê Evdilmelik ê bi navê Melek navdar, bi bîr tîne. Rotînda di bersiva çend pirsên me de rexneyê li Tevgera Çandê digire ku li Evdilmelik û çend navên din têra xwe xwedî derneketiye û dibêje, "Lê belê divê em xwedî li wan derkevin, belkî wan demeke kin xebatên çandê kirin ji bo hunerê Kurdî, lê belê heger bijiyana belkî her yek ekolek bûya niha. Ji bo vê yekê, ez kêmasiyê di serî de bixwe di xebatkarên çandê de jî dibînim."

**Evdilmelik û te, we kengî û li kû derê hev nas kir?**

Sala 89'an ez çûm Stenbolê. Nasîna min bi Tevgera Azadiyê re çêbû. Ez bawer dikim 6, 7 meh dûre bû, yan dawiya 89'an bû yan jî destpêka 1990'î bû. Vê çaxê komelên me tine bûn, ez bawer dikim navê Wan Medya Guneşî bû ne şaş bim, çepê Kurdan bûn, komelaya wan hebû. Min li wê derê dersa muzîkê dida. Rojekê wan pêşniyaz kir, gotin, hûn dikarin komekê çêkin, Newroz tê, em di Newrozê de wê komê derxin. Me got, belê. Merdan vê çaxê gelek ciwan bû, 17 salî bû û gotin hevalek heye ji Rojava ye, dengê wî pirr xweş e, ew jî bila tevlî koma we bibe. Me got, li ser çavan. Hat Melîk hat. Cara yekemîn min li wir dît. Xortekî zirav bû, bejna wî gelek bilind bû û esmer bû. Gotin, li Enqerê tibê dixwîne, vê gavê hatiye wira. Nasîna me bi vî awayî çêbû. Paşê, me hinek sohbet kir, got, me kasetek bi navê Koma Amed derxistiye, ev ê li wir dibêje, ez im. Min got, dengê te pirr xweş e. Her wiha em hinek bi hev re xebitîn.

Nego şehîd bûye ez dibêjim, dengê wî dengekî enterasan bû, dengekî xurt bû û rengekî cuda bû. Û ez wer hêvî dikim, heger ku bijiya, dikarî bibûya ekolek di muzîka Kurdî de. Paşê Navenda Çanda Mezopotamya (NÇM) vebû em bi hev re hatin wir. Ez jî, ew jî di damezirandina wê de hebûn. Li wir, ket nava Koma Çiya. Di komê de navbera wî û Beser baş nebû. Bi Koma Amed re kasetek derxist. Mixabin wan jî hîç behsa wî nekir heta demekê, ez vê wek rexne jî dibêjim. Koma Çiya jî, ez çawa bibêjim, di navbera wî û Beser de, dengê Melîk xurt bû di nav wan da hinek hesûdî hebû. Demeke pirr kurt bû, bi çi rengî bû ez pê tam nizanim, beriya kaseta Koma Çiya derkeve çû çiya, ez bixwe nikarim bi berfirehî qala vê pêvajoyê bikim. Di demeke pirr kurt de çû çiya, di ser re sê, çar meh derbas nebûn, xebera şehadeta wî hat.

**Çima ji Koma Amed çû nava Koma Çiya?**

Ez bawer dikim di sala 88'an de kaseta wan a Kulîlka Azadî derketibû jixwe, kaseteka resmî nebû, di bin destan de belav dibû, min jî ev kaset yan 88 yan jî 89 bû ji Kurdekî girtibû û wer lê guhdarî dikir. Ji ber ku min dixwest kaseteke Kurdî çêkim, ji min re dengê wî pirr balkêş hatibû. Dengê wî xurt bû, bas barîton bû.

Dixwest karê xwe yê muzîkê bi pêş ve bibe, jixwe, di nav NÇMê de ji bo vê cih girtîbû. Berî her tiştî welatparêz bû û dil dabû Tevgera Azadiyê. Wê çaxê ez jî hevalên wek wî jî me dixwest hunerê xwe di nav Tevgera Azadiyê de bikin.

**Dengê wî belav bû, lê kes navê wî û bi serpêhatiya wî nizane; sebeba vê li gorî cenabê te çi ye?**

Niha muzîk bê sînor e, ti sînor nikare muzîkê bide sekinandin. Faşîzm be, kapîtalîzm be, komunîzm be, çi dibe bila bibe, nikare pêşiyê li muzîkê bigire, ji ber ku sînoran nas nake, diherike. Dengê wî jî bi vî awayî bi muzîkê sînor nas nekir. Ji ber ku wê demê televizyonên Kurdan tinebûn wek niha, çapemeniya Kurdî bi pêş neketibû û wêneyekî wî di cihekî de derneket, insanan wêneyên wî nedîtin, lê belê dengê wî ket guhê hemû Kurdan. Yan jî em bibêjin insanên ku dixwestin li muzîka Kurdî guhdarî bikin jixwe wê çaxê jî pirr kêm bûn, çend kes hebûn. Ji ber vê jî bi muzîk, bi dengê xwe hat naskirin lê belê bi şikil bi resmê xwe nehat naskirin. Û mixabin di demeke pirr kurt de şehîd bû. Ez dikarim wek rexne jî bibêjim Koma Amed jî Koma Çiya jî li navê wî xwedî derneketin, nedan nasîn, nizanim bi zanetî yan ne biqesd, ez kesî di wî warî de sûcdar nakim, lê wekî rexneyek ev heye. Min sala 1996'an de di Med TV de cara yekem, li ser Evdilmelik Şêx Bekir bernamyeke saetekê dirêj çêkir, xwişka wî hebû li Swedê, ew tevlî bernameyê bû. Ji Rojava jî çend hevalên wî tevlî bûn, bernameyeke dewlemend bû. Min bi xwe jî pirr zêde ew nas nedikir jî di warê muzîkê de pirr kêm em bi hev re xebitîbûn, di nava du mehan de min bi wî re xebata mûzîkê çêkiribe jî, ew jî nîvco bû.

Ez rexne bikim. Mixabin Tevgera Çandê jî tam bi rola xwe ranebû. Ne tenê Evdilmelik jî, mesela Çiya yek ji damezirînerên Koma Berxwedan e û wî rengê xwe daye gelek berheman, ew jî zêde nayê naskirin. Dîsa Argeş dengekî wekî Evdilmelik Şêx Bekir dewlemend û xurt, ew jî di demeke pirr kurt de şehîd bû. Ew jî zêde nayê nasîn. Ez jî tam nizanim çima belkî jî zirûfên şer e, belkî jî girêdayî psîkolojiya insanan e. Lê belê divê em xwedî li wan derkevin, belkî wan demeke kin xebatên çandê kirin ji bo hunerê Kurdî, lê belê heger bijiyana belkî her yek ekolek bûya niha. Ji bo vê yekê, ez kêmasiyê di serî de bixwe di xebatkarên çandê de jî dibînim.






www.arsivakurd.org

# Filmek li ser Melek

Îro roj li Rojava di şert û mercên a niha de ji bo mayîndekirina bîranîn û hunerê wî wekî mînak mirov dikare li ser navê wî akademiya muzîkê an jî navendeke hunerî ava bike.



Havîn Saç a ku derhêneriya filma bi navê Gecikmiş Ağıt (Zêmara Derengmayî) ye, di vê filmê de behsa serpêhatiya ji damezrênerên Koma Amed, Melek dike ango Evdilmelik Şêx Bekir. Havîn Saç a ku sala 2014'an filma xwe temam kir, weke sedema kêm naskirina Melek ê ku bi strana Rindê hema hema hemû Kurd dengê wî nas dikin, îşaret bi tercîha berxwedana Tevgera Azadiyê ya Kurd dike: "Di salên 90'î de hizra hunerê kolektîf ku li ber zext û zilma li ser nasname û çanda Kurdî rabû, hilberîna şexsî tercîh nekir. Ekola 'kom'an jî ji şexsan wêdetir xwedî karekterekî kolektîf û hevgirtî bû. Di saziyên Tevgera Azadiyê de jî sazîbûnên kolektîf ên bi vî rengî jî bi pêş diketin." Evdilmelik jî di vê çarçoveyê de yek ji wan kesan bûye ku ji navê xwe bêhtir xwestiye navê komê darîçav be. Em bi Havîn Saç re li ser pêvajoya çêkirina belgefîlmê û maneya Melek ji bo wê peyivîn.

**- Fikra çêkirina belgefilma li ser jiyana Evdilmelik Şêx Bekir ji kû hat bîra te?**

Nifşê min bi lêguhdarîkirina komên NÇM'ê mezin bû. Nexasim Koma Amed, kêfa min pirr ji Koma Amed re dihat. Hê jî, ji bo min cihê strana wan a 'Rindê' pirr taybet e. Gava min li vê stranê guhdarî dikir jî, min ji xwe re digot, çima derheqa Evdilmelik Şêx Bekir de bi pirr kêm tiştan dizanim. Her wiha, gava min li derûdora xwe jî pirsa wî dikir, bersiveke têr û tijî min nedibihîst. Li ser vê yekê ez ketim pey şopa lêkolanê.

**- Çima navê Evdilmelik Şêx Bekir bi qasî dengê wî li Kurdistanê belav nebû? Gelek kes dengê wî nas dikin, lê bi navê wî, bi serpêhatiya wî nizanin?**

Di salên 90'î de hizra hunerê kolektîf ku li ber zext û zilma li ser nasname û çanda Kurdî rabû, hilberîna şexsî tercîh nekir. Ekola 'kom'an jî ji şexsan wêdetir xwedî karekterekî kolektîf û hevgirtî bû. Di saziyên Tevgera Azadiyê de jî sazîbûnên kolektîf ên bi vî rengî jî bi pêş diketin. Ev jî ne bi rêya şexs û kesayêtên bi serê xwe pêk dihat, bileksê vê, têkoşînek û hewleke hevpar pêk dihat. Evdilmelik jî yek ji wan kesan bû ku ji navê xwe wêdetir dixwest navê komê xuya û darîçav be.

**- Di belgefilmê de, li Rojavayê Kurdistanê ti kesî behsa wî nedikir. Hevalê wî yê zaroktiyê nivîskar Helîm Yûsiv behsa wî dikir, lê ew jî li Ewrûpayê bû. Çima lingê Rojavayê Kurdistanê di belgefilma te de kêm bû?**

Hê şoreşa Rojava pêk nehatibû me dest bi çêkirina belgefilmê kiribû. Gava sala 2011'an ji bo çêkirina belgefilmê ez çûm Qamişlo û Amûdê hê jî miletê wir di bin nîrê zordestiya rejîma Baesê de bû. Lewma jî kesî nedixwest ji bo belgefilmê bipeyive. Vê yekê jî kir ku lingê Rojava kêm bimîne. Ne ji vê ba têra xwe isan hebûnku dikarîn derheqa wî de bipeyivin.

**- Gava te xwest derheqa Evdilmelik Şêx Bekir de gefilmekê çêkî, di berhevkirina agahî û belgeyan de te zehmetî kişand? Wekî mînak derbarê Evdilmelik Şêx Bekir ku êdî li Çiyayên Kurdistanê bûye Dr. Cuma de hema hema ti agahî tinene, yan jî em bi wan nizanin?**

Di amadekirina vê de ji bo min tişta herî zehmet, xebata arşîvê bû. Jixwe, di salên 90'î de him berhevkirina arşîvê him jî parastina wê bi serê xwe meseleyek bû. Bi rêya hin kesan, min agahî berhev kirin û vê jî kir ku ez pêşiya xwe bibînim. Di nav nas, heval û hogirên wî de ku weke mekan Qamişlo, Amûdê, Mêrdîn, Amed, Stenbol û Elmanya di nav de bûn, min xwe gihand wan lê qada gerîla kêm ma. Lê piştî ku belgelfilm qediya hin kesên xwedî agahî jî wir xwe gihandin min, lê ji ber min qedandibû, min nedikarî wan li belgefilmê zêde bikim.

**- Çima navê Evdilmelik Şêx Bekir hate jibîrkirin? Gelo ji ber ku Kurdê Rojavayê Kurdistan bû, yan pirr zû şehîd bû? Çi bû sedem li gorî te?**

Şehadeta Evdilmelik Şêx Bekir rastî salên 90'î hat ku wan çaxan wendahiyên mezin hebûn. Him nebûna dezgehên ragihandinê him jî zêdetir xuyabûna 'kom'an kir ku Evdilmelik Şêx Bekir nehat naskirin. Lê belê bi ya min hê jî ne dereng e. Îro roj li Rojava di şert û mercên a niha de ji bo mayîndekirina bîranîn û hunerê wî wekî mînak mirov dikare li ser navê wî akademiya muzîkê an jî navendeke hunerî ava bike. Bi ya min ev yek herî xweş li bajarê çêbûyê Amûdê tê.

**-Piştî belgefilma te gelo hin kesan negote te, "Xwediyê vî dengî ku bi salan e me lê guhdarî dikir, ev bû naxwe?" Reaksiyonên bîneran çawa bûn?**

Di vê belgefilmê de ti armanca min a serketina şexsî tine bû. Esas, min dixwest bibim pirek di navbera bîner û hunermedekî de ku salên dirêj min lê guhdarî kiriye. Min dixwest di qada hunerî de hebûna mirovekî wekî wî hêja berbiçavtir bibe ku ev qad bi berdelên mezin a Tevgera Azadiyê ya Kurd çêbûye. Jixwe, navê filmê jî ji bo vê bû 'Zêmara Derengmayî'. Lê mixabin film liqayî elaqaya sazî û festîvalên Kurdistanî nehat. Ji xeynî Festîvala Belgefilman a Amedê, li ti deverê dernekeket pêşberî bîneran. Piranî berteka insanan, hestiyarî bû. Wekî mînak kesên ku heman pêvajoyê jiyane û nifşên nû jî ji bo ku haya wan ji mijarê tinebû li ber xwe diketin.

## Melekê dengê Kulîlka Azadiyê

Evdilmelik Şêx Bekir an jî Melek. Dengê wî yê bîra nifşekî ye, va ye, dibe 30 sal ku li her derê Kurdistanê dengê wî bilind dibe. Awazên wî mîna anatomiya salên 90'î ne. Mirov nizane, bêbextiya muzîkê ye, ji ber ku deng belav dike bêyî ku hewcedarî bi şikl û şemal, nav û paşnav bibîne, yan gelo ji ber zor û zehmetiya salên 90'î û çetinbûna şerê wan çaxan e, yan jî ji ber ji Rojavayê Kurdistanê bû pirr nehat naskirin… Her ku mirov li ser bifikire, hincet û sebebên nû dibîne. Jiyana Evdilmelikê ku 24 salî dibe şehîdê Kurdistanê, di sê qonaxan re derbas dibe.



**Qonaxa yekem: Melek**

Sala 1968'an li Amûdê tê dinê. Navê wî li ser nasnameyê Evdilmelik Şêx Bekir e lê di nav malbat û hevalên xwe de wekî Melek dihat binavkirin. Ji bo xwendina zanîngehê pêşî tê Enqereyê û li zanîngeha Hacettepeyê dest bi xwendina tibê dike. Sala 1988'an li Enqereyê xwendevanên tibê, Gulşen Çetin, Savaş Çakmak, Rohat Kutlay, Fikri Kutlay, Mustafa Kart û Ahmet Kaya nas dike û bi wan kesan re Koma Amed ava dike. Wan çaxan, Koma Amed li gel Koma Dengê Azadiyê ji komên muzîkê yên ewil e ku piştre di muzîka Kurdî de derî li ekola 'kom'an vedikin. Li gel muzîkê, Melek di resm û helbestê de jî şareza bû. Sala 1990'î, Melek derbasî Çapa Tib a Stenbolê dibe. Kaseta Koma Amed a ewil Kulîlka Azadiyê jî heman salê derdikeve. Melek ji bo qeydên studyoyê vedigere Enqereyê û bi zor û zehmetî kaseta Kulîlka Azadiyê derdixin. Di kasetê de 13 stran hene û pirraniya wan jî Melek dibêje.

**Qonaxa duyem: Şengal**

Sala 1991'ê, êdî Melek dibe Şengal. Hin kesên wê salê ew nas kiriye, bi vî navî wî nas dikin. Heta sala 1992'yan endamên Koma Amed di hevpeyvîna xwe ya rojnameya Welat de, gava behsa haziriya kaseta xwe ya duyem dikin, bi van hevokan behsa wî dikin: "Ji ber ku dengê heval Şengal tine ye, em ê pirr zorahiyê bibînin." Sala 1991'ê Navenda Çanda Mezopotamya li Stenbolê vedibe ku Şengal jî di avakirina vê de heye û heman salê jî tevlî Koma Çiya dibe. Lê berî kaseta Koma Çiya ya bi navê Rozerîn derkeve havîna wê salê, tevlî nav refên gerîla dibe.

**Qonaxa sêyem: Dr. Cuma**

Di nav gerîla de navê şervan ê Cuma li xwe dike. Piştî salekê li Çiyayên Engîzekê şehîd dibe. Li gorî di weşana Serxwebûnê de hatiye nivîsîn, di meha Nîsanê de şehîd bûye. Piştî şehadeta wî, Serxwebûn (a Çile/1993'yan) bi van hevokan behsa Melek ê ku êdî Cuma ye, dike: "Di demeke kin de hînî jiyana gerîla bû û bi awayekî aktîf tevlî xebatên şer bû. Ji bo hemlaya şer a bihara 1992'yan zivistana 1991'ê bi perwerdeyê bihurand. Di mehên biharê de li gel komek hevreyên xwe ji bo tevlî kar û xebatan bibe, bi rê dikeve. Lê belê rastî çeteyan tên. Bi wan re demeke dirêj şer dikin. Li wir birîndar dibe û ji bo hevalên wî bi saxî bifilitin bi tena serê xwe şer dike. Bi saya wî, hevalên wî xwe rizgar dikin. Heval Dr. Cuma ku guleyên wî qediyabûn bi birîndarî dikeve destê xulamên dewleta Tirk û tê qetilkirin. Liberxwedana Dr. Cuma nûwaze û mêrxasî bû, mînaka herî esîl a fedakariyê bû." Dr. Cuma şehîdekî bê kel û gor e, mirov ji bo wî dikare 'tacegul'ekê deyne çiyayên Kurdistanê ku ew di sînga xwe de hewandiye.

www.arsivakurd.org

# Perestgeha Modernîzmê: Bajar

Helîm BARÎN

Mirov bi civakîbûna xwe ji zindiyên din cuda dibe. Civakîbûn gewherê mirov e. Lêkolînên li ser mirovan di heman demê de lêkolînên li ser civakê ne. Ji ber vê yekê, hemû beşên zanistiyê di bin banê civaknasiyê de watedar in. Têgîna mirov a heqîqetê bi civakîbûnê sînorkirî ye. Ji ber van sedeman, heqîqet li ser zemîna civakê xwe hildiberîne.



Civak weke her tiştî, xwe di nav cî û demê de şênber dike. "Di çerçoveya berfireh de têkiliya mirov û erdnigariyê, divê her gav li ber çavan bê girtin."… "Dîrok bê cî çênabe" Her civak bi bandora xwezaya ku di tê de ye teşe digire û li gorî taybetiyên xwe (hişmendiya civakê) jî bandorê li xwezaya xwe dike, ango bandorê li hev dikin. Xwezaya ku bi bandora civakê teşe girtiye, êdî dibe parçeyekî çandê (xwezaya duyemîn). Gund û bajar wiha ne. Gund ew mekan e ku encama lihevkirina xweza û çandê ye. Hevsengiya civak û xwezayê di xwe de dihewîne. Gundiyan ji civaknasên ekolojîst bêhtir girîngiya xwezayê fêm kiriye. Ji şaristaniyê sûd wergirtine, lê ew neanîne asta ku xwezaya xwe xera bikin. Şoreşa Neolîtîk şoreşa gund e. Mirov ji nêçîrvanî û berhevkirinê bi Şoreşa Neolîtîkê bi cî û war bûn. Mirov bi hezar salan tenê bi formên gundan jiyaye.

Lê civakê li gorî pewîstiyên xwe bajar jî ava kirine. Bajarên ewil di dawiya Neolîtîkê de hatin avakirin. Bi bajarvanîbûnê re şaristaniyê jî dest pê kir. Em dikarin bibêjin ku dîroka bajaran dîroka 'şaristaniya navendî' ye. "Têgeha şaristaniyê di wateya berfiref a çandê de bêhtir civaka ku di qonaxa di çîn, bajar û dewletî de ye, derdibire. Çînayetî, bajarîbûn û dewletbûn têgehên bingehîn ên civaka şareza ne". Bajar di destpêkê de ji bo civakê ne pirsgirêk bûn. Gelheyên wan, serjimara wan ne weke niha bi milyonan bûn. Ji her deh gundan re bajarek diket. Bajaran li Sumer û Misrê xwe li gorî gundan dîzayn dikir. Di neqeba wan de hevsengî hebû. Ji hev sûd werdigirtin. Gund cihê hilberînê û bajar jî cihê danûstendinê bûn.

## Xweda û pere ji bo bajêr

Lê "Bajar şiyana jîrîtiyê ya mirovan diazirîne, derdixe." Bi vê taybetiya xwe hem bi kapîtalîzmê re hem jî bi netewe-dewletê re li hev tên. Bajar bi gelek taybetiyên xwe kakila netewe-dewletê ye. Jixwe, beriya forma netewe-dewletê, bajar-dewlet hebûn. Ev yek bû bingeh ji bo netewe-dewletan. "Bajarbûyîn di hembêza xwe de koletî û her wiha dewletbûyînê dihewîne"… "Endûstrîparêzî û bûrokrasî bi sedsala 19´emîn re bajar pirr mezin kirine, ev mezinbûna bêwate û kanserolojîk ji bo hawîrdorê weke bobelatekê bi encam bûye. Bajar tenê xwe nakuje, hawîrdor û gund jî miçiqandine û kuştine" . Tekiliyên mirovan li bajaran êdî ne li gorî exlaq, bêhtir li ser huqûqê çêdibin. Bîyanîbûn di asta herî bilind de li bajaran dibe bela serê mirovan. Desthilatî bi rêya medyayê (Filmên Yeşîlçamê) weke ku tenê axatî û xulamtî li gundan hebe nîşan dide û bi vî awayî gundan biçûk dixe, bê îtîbar dike, lê ev form (axatî, xulamtî, desthilatî) bi awayekî tundtir û veşartî li bajaran di bin navê patron û karkeran de heye. Bi qasî ku li bajaran bû, koletî ti carî ew qasî rewa û normal nebûbû. Bi kapîtalîzma fînansê re êdî çandinî û ajalvanî jî bi kêrî karsazan nayên û her diçe kêm dibe. Pere qezençkirina ji pereyan, derbên mezin li çandinî û ajalvaniyê dixe. Yên di bin bandora hişmendiya moderniteya kapîtalizmê de dimînin dev ji gund û axa xwe ber didin û berê xwe didin metropolan. Li metropolan, li gettoyan dijîn û dibin keda erzan ji bo sermayedaran. Li Kurdistanê gund ne bi tenê bi darêzorê, her wiha bi avakirina hişmendiya modernîteya kapîtalîst vala bûn. Çawa Rahîbên Sumeriyan, ji bo gel qaneh bikin ku bajêr înşa bikin, Xweda afirandin, hêzên modernîteya kapîtalîst jî Pere kirin şûna Xweda û bi hişmendiya xwe gel qaneh kirin da ku werin bajaran û di xizmeta wan de bixebitin. Bi vê azirandinê desthilatî bajara dike weke qefesa hesinî û bi rasyonelîzmeke li dijî bajêr, bajaran ji formên wan ê ewil derdixe. Êdî bajar diyardeyeke li dijî civakîbûyîn û gundan e û wiha bidome bi dawiya xwe re dê dawiya gerdûnê jî bîne.

## Bajarên li dijî xweza û civakê

Bajar ji rewşa xwe ya niha encax bi paradîgmayek ku xwe ji modernîzmê xelas kiriye derê. Hemû tevgerên ku li dijî desthilatiya hegemonîk rabûne, ji ber ku ji modernîzmê qut nebûn, taliya wan jî têkçûn bû. Rêberê Gelê Kurd bi taybetî marksîzm û tevgerên bi vî rengî ji ber vê sedemê rexne dike û çareseriyê encax bi qutbûyîna ji modernîteya kapîtalîst  (Kapîtalîzm, Endûstreyalîzm, Netewe-dewlet) dibîne. Heger modernîte, şêwaza jiyanê be, divê li hemberî şêwaza jiyana modernîteya kapîtalîst, civaka xwe ji nû ve ava bike. Ev yek, bêguman xurtkirina modernîteya demokratîk e. Bajarên niha li dijî civakê bin, divê civak van bajaran li gorî berjewendiyên xwe ji nû ve ava bike. "Gund û bajarên ku ji nû ve ava bibin, dê bibin du lingên xurt û mêjiyê Modernîteya Demokratîk".  Hevsengiya gund û bajar dîsa dê bi têkiliyek sîmbîyotîk çêbe. Bajarên bi milyonan feraseteke navendparêz e û divê ev navendîbûn bela bibe. Bûna li dijî xwezayê li dijî civakîbûyînê ye. Ji ber vê divê bajar ti carî neyê asta xerakirina xwezayê. Bajarên heyî, bi feraseta endustriyalîzmê ava bûne û ji ber vê yekê, bûne weke girtîgehê. Avahiyên beton û rêyên qetran ku niha weke pêşveçûn tên hesibandin, di rastiya xwe de kuştina xwezayê ne. Divê ev rasyonalîzma ziwa têk biçe û li şûna vê ji bo jiyana azad qadên watedar hebin. Bajar divê li gorî berjewendiyên civakê ava bibe.

Bajarên heyî, bi feraseta endustriyalîzmê ava bûne û ji ber vê yekê, bûne weke girtîgehê. Avahiyên beton û rêyên qetran ku niha weke pêşveçûn tên hesibandin, di rastiya xwe de kuştina xwezayê ne. Divê ev rasyonalîzma ziwa têk biçe û li şûna vê ji bo jiyana azad qadên watedar hebin. Bajar divê li gorî berjewendiyên civakê ava bibe.

**** Gotinên jibergirtî, nivîskar ji ber nivîs û pirtûkên Abdullah Ocalan girtine.***

# Kumên dara bambû ji bo Jizo



Hiç, bextê min nebû. Bêje, çima em ligel hev bazarekê nakin? Ez dê hemû derzîtêlên te bikirim û tu jî hemû kumên min ên bambû bikire.

Hebû, tinebû, di nav kûrahiyên çiyanên Japonî yên bi berf de merivek û jina wî hebûn. Ew gelek feqîr û nedar bûn. Lê belê mirovên sade û xweş bûn û ji hev pirr hez dikirin. Salekê berf zûtir barî û dem bi taybetî gelek asteng bû ji bo wan. Dema ku sersal hat, ji bilî kulîçeyên sersalê, tiştekî wan tinebû ku bixwin.

"Te bihîst?" meriv ji jina xwe re got. " Ez pirr birçî me, zikê min qoreqorê dike."

"Baş e, canê min. Ev derzîtêla ciwan a min heye. Min demeke kevin çêkiriye, ji bo demekê wisa min hiştiye."

Meriv ecêb ma. Wî li derzîtêla ku bi morîyen rengîn hatiye xemilandin nihêrî, "Heger ez van bibim bajêr û bifiroşim" got, "bêguman em ê têrî pereyê kulîçeyên sersalê qezenc bikin." Meriv xwe ji bo çûyina bajêr amade kir. Cil û bergên xwe yên herî germ bo roja herî sar a salê li xwe kirin.

Offff …..çi sar e derve

"Hay ji xwe hebe canê min."

"Bila be. Di demeke kurt de ez ê vegerim."

Wî destmala ku jinikê dayê, li serê xwe girêda. Dûvre ji mal derket û bilerizîn kete nav bayê sar. Jina wî li dergehê rawestî û heta ku ji çavan dûrket û ket nav daristanê li wî nihêrî, wî ji xwe re stranek digot.

Jor vî girikî, jêr vê rê ye
Lo lo, hey hey, hoy hoy
Li hember çiyan, li nav newalan
Lo lo, hey hey, hoy hoy

Wî ew selika ku tijî terzîtêlên bi destê jina wî hatine çêkirin, li pişta xwe girêda bû.

Van derzîtêlan bifiroşe, ji bo sersalê
Lo lo hey hey hoy hoy
Em dê kulîçe û pasta û masî bixwin
Lo lo hey hey hoy hoy

**Dîtina Jizoyan**

Meriv bi rêya xwe diçû û li dû hev helbest digotin. Ta ku hate serê Lûtkê Jizo. Li wê derê rawestî. Wekî pirr caran kirî, ji bo ku rêza xwe nîşanî 6 peykerên Jizo bide. Jizo parastgarê zarokan bû. Ji beyanî heta êvarê berf dibarî û li ser serê Jizo xwe digirt.

"Rojbaş birêzino," mirov ji peykeran re got, "Oyyy oyyy. Dibe ku ji bo we gelek sar bibe. Bihêlin..." Mirov destmala xwe derxist û berfa li ser hemû peykeran pakij kir.

"Aha binêrin. Niha ez baştir im. Baş e, birêzino, ez diçim bajêr ji bo derzîtêlên jina min çêkirî bifiroşim. Dema ku ez vegeriyam, ez dê bo we kekên birincî bihêlim. Ji bo min bextekî xweş bixwazin. Baş e, em dê hevdu bibînin."

Dema ku ew gihişte bajêr, êvar bû. Mirov pirr dihatin û diçûn. Erebok û table bi zorê li kolanan bûn. Meriv li navenda kolanan serekî rawesta û bi dengekî berz da qîran: "Derzîtêl derzîtêl! Derzîtêlên rind ji bo jinan!"

Lê dema sersalê bû. Mirovên ku derbas dibûn gelek karên wan hebû û nedikarîn nihêrînekê derzîtêlan bikin. Paşê ji demjimêrekê zêde li hêviya meriv nema.

"de-de-derzîtêl … …ahhh….Mirovek …."

**Bazara derzîtêl û kumên bambû**

Wê demê bazirganekî ne serketî jî hat. Wî li merivê ku ligel selika xwe ax û nalîn dikir, nihêrî û pirs kir, "Te tiştek firot?"

"Axxx. Te çi kir?"

"Hiç, bextê min nebû. Bêje, çima em ligel hev bazarekê nakin? Ez dê hemû derzîtêlên te bikirim û tu jî hemû kumên min ên bambû bikire."

Belê. Ev fikreke baş e.!

Bi rastî ev gelek baş bû.

Karê ku wan kirî bihevguhertina tiştên ku kesî nedikarî bikire bû. Lê belê ji bo herdukan jî bêhtir bû. Meriv vegeriya malê bi kumên bambû yên li ser pişta xwe. Berf zêdetir dibarî dema ku ew gihişte serê lûtkeya Jizo.

"Li min negirin," meriv ji peykeran re got. "Min nikarî kekên birincê bo we bikirim. Min bibexşînin ji bo ku ez nikarim tiştekî bidim we. Lê….Ka deqekê. Dûmahiyê, ez dikarim bikim ku berf wisa li we negire." Û meriv berfa li ser peykeran paqij kir û kumên bambû dan ser serê wan

"Yek ji bo te, û yek ji bo te. Binihêre, niha serê we ewqas dê sar nebe. Yek ji bo te û yek ji bo te, û… oh oh. Pêwîst e yekî din hebe. Li min negire, Jizoyê Piçûk. Aha, vî bi kar bîne." Meriv destmala xwe derxist û li seriyê peykerê herî piçûk girêda.

Niha rewşa wî baştir bû, û bi fîtikan reya xwe dewam kir wekî merivekî dest ji cihanê berdayî. Û li lutkeyê Jizo şeş çavên keviri li wî nihêrîn dema ku ji çiyayên bi ba, bi rêya xwe dakete xwarê.

Bi demekê meriv gihişte mal, berf rawestiyabû, û şeveke aram bû. Tiştên ku wê rojê bûyî hemû ji jina xwe re gotin. Dema ku jinê bihîst ku kumên bambû dane şeş Jizoyan, keniya û got, "Ew tiştekî baş bû te kir."

"Tu rast dibêjî?" meriv fedî kir. "Spas. Baş e, em çima venagerin hundir?" Belkî hîç kekên me yên birincê nîn in, lê em dikarin bibin xwediyê xewnên xweş ên sersalê." Li ser çiyan wê şevê wisa bû, hemû cihan nêzikî xweda bû. Ji bilî şeş siyên ku hêdî hêdî layê daran ve diçûn. Belê, peykerên Jizo ji cihê xwe çûbûn. Ji çiya newal û çeman derbas bûn û dûmahiyê hatin mala herdu belengazan.

**Xweda hatin, ketin û çûn**

"Hişş.. bêdeng, bêdeng……." Jizoyan tûrikên di dest xwe de li ber derî vala kirin. Ji bo malavahiya kumên bambû her yekî bi diyariyekê hat. Kek, masî, xwarin, vexwarin, cil û bergên germ… û Jizoyê herî piçûk bi kîsekî birincê yê mezin hat û li ber malê danî. Hoooppp…teq req, teq req, teq req… Jizoyê piçûk ji derba xwe ket. Diyariyên xwe dan erdê û li hemberî peykerên din ket, û yên din yek bi yek wekî kevirên domîno ketin.

Ew çi bû? Meriv pirs kir, bi vî dengî ji xewê rabû. "Te ji derve tiştek bihîst?"

"Here binihêre ew çi ye, canê min."

Jinikê da dûv mêrê xwe dema ku meriv derî bi nîvî vekir heyirî li derve mêze kir. Xeyal bike ku ew çawa ser mabûn dema ku peykerên Jizo li rêz dihejiyan. Piçûktirîn Jizo, ku li dûmahiyê bû, rawesta ta ku li meriv û jina li paş xwe matmayî binihêre. Gelek rêza wan girt û bi lez çû ku bigihîje peykerên din.

"Çi… Ev çi ye?"

Meriv û jinika wî çav li koma diyariyan ket ku li ber deriyê wan in.

"Bi -binêre canê min!"

"Oxxx…" bi bêhneka fireh got, "Ma eva gelek seyr nîne?"

Meriv û jina belengaz di sersalê de gelek gelek şad bûn. Û bi rastî paşê jî her dem bi şadî jiyan.

***Jizo di ola Şînto ya Japonî de nave xwedayekî ye. Ew zarokan diparêze.***

***Wergera ji Japonî û Inglîzî: Vakkas Çolak***

û Jizoyê herî piçûk bi kîsekî birincê yê mezin hat û li ber malê danî. Hoooppp…teq req, teq req, teq req… Jizoyê piçûk ji derba xwe ket.

www.arsivakurd.org



Uzun bi vegotina xav û besît jî serketî bû

# Di peywenda bêdemiyê de Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê

◆ Serpêhatiya Evdalê Zeynikê struktur û avahiyên civakî yên Kurdan derdixe holê bi dilşahiyeke nostaljîk, bi rêze-peywendiyeke bê arîşe û kêşe ku tê de desthilat û xelkê ji 'amê di nava ahengeke bêqisûr de ne; û ev ahenga bêqisûr jî bi tênê dikare bê xirakirin bi destwerdana biyaniyan ji derve û li vir ev hêza xerîb jî Paşayên Osmanî ne.

www.arsivakurd.org



Dr. Kawa MORAD

"Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê" yek ji berhemên fiksiyonê yên destbêkê yên Mehmet Uzun e. Di vê romanê de bi rêya dengê Mehmet Fermanê Kîkî, ew serpêhatiya Evdalê Zeynikê vedibêje; zehmetiyên wî, bextreşiya wî ya xwe bi ser wî de berdide hem weke şexsekî û hem jî weke dengbêjekî. Roman dikare weke şîroveyeke ne bi xetên stûr, a narîn a li ser dîrok û tecrûbeya Kurdan bê xwendin ku bi serpêhatiya Evdalê Zeynikê û îfadekirin û bi gewdekirina tecrûbeya Kurdan bi kilamên wî sembolîk tê temsîlkirin.

Roman li gelek beşan hatiye dabeşkirin, her yek ji wan bi karekterekî dadikeve yan jî bi bûyerekê dadikeve ku peywendiya wê heye bi wê serpêhatiya Evdalê Zeynikê re ku di bîra gelêrî û çandî de tê mihafezekirin. Hiseke lihevnekirinê carinan illeh xwe dide der ji bo xwînerî; pirr diyar nîne ka pêwendiya hin ji meseleyan çi ye bi mijara giştî ya romanê û mijara sereke ya vegotina romanê re. Lê belê belkî jî ev yek bi awayekî aqilane hatibe rewakirin di destpêka romanê de; Fermanê Kîkî, bêjerê ku erka vegotina serpêhatiya Evdalê Zeynikê lê hatiye barkirin, di destpêka romanê de dibêje, nivîs ne ji wan karan e ku ew di wan de hoste be. Li aliyê din belkî jî ew hisa jihevqutbûnê, dewamnekirinê ya di tevahiya romanê de karibe weke agahdarkirina li ser armanca dawî ya berhemê bê şîrovekirin: hewldaneke yekkirin û lihevanîna xweza û mirovî, rastî û xeyalê, gotina nivîskî û ya devkî, Kurd û yên din ên wan, rabihurî û niha bi rêya mekanekî dema wê jêbirî, yan jî mekanekî bêdem.

### Çima Evdalê Zeynikê?

Aliyekî ku ez hez dikim berê awirê xwe bidimê, tercîha Uzun a weke karakterê sereke yê romana xwe bijartina Evdalê Zeynikê ye. Ji bo çi Evdalê hatiye tercîhkirin ji bo ragihandin û belavkirina van peyaman? Sedema herî darîçav ew diyar e ku Evdalê Zeynikê dengbêjekî navdar e, ne tenê di serdema xwe de lê di saxiya Mehmet Uzun de jî. Wisa hizir tê kirin ku Evdal di navbera salên 1800'î û 1910'an de jiyabe; Evdal di gelek meseleyan, serpêhatî û kilaman de tê bibîranîn, di bîra civakî de cihê xwe girtiye; vê jî ji bo wî cihekî mîstîk di nava bîra dîrokî ya Kurdan de misoger kir, nexasim jî di nava dengbêjan de. Bibîranîna Evdal bi rêya wan kilaman diçe serî ku li ser ji destdana fer û roniya çavên wî, evîna wî, û mijarên din hatine çêkirin. Hin ji kilamên evdalê Zeynikê, ewên ku wî bi xwe nihurandine, wî gotine, roja me ya îro jî hîna bi destê dengbêjan tên gotin.

### Ji bo armanceke eşkere vegotineke xav

Beşa yekem bi awayekî besît yan jî xav ê vegotinê îşaret bi wê yekê dike ku çîroka Evdalê Zeynikê tê gotin da ku bersiva pêdiviyekê bê dayîn: bêhtir mirov divê Evdal nas bikin, û bi rêya wî dewlemendiya çanda Kurdî û wêjeya wê. Bêjer ango Fermanê Kîkî, ji ber vê yekê dibêje, ew serpêhatiya Evdalê Zeynikê dinivîse ji ber ku birayên Bedirxan vê yekê ji wî bi israr dixwazin. Ji ber vê sedemê ji bilî çend detayan, hêmanên sereke yên serpêhatiya Evdalê Zeynikê dilsozê reng û awayê bibîranîna wî ya di bîra çandî de ye. Ew wan bûyerên diyarker ên di texeyula gelêrî de mihafeze dike ku peywendiya wan bi Evdal re tê danîn.




Helbet, mirov pirr zêde qîmet bide navdarbûna Evdalê Zeynikê weke sedema hilbijartina wî weke fîgurê sereke yê vegotina vê romanê ji aliyê Mehmet Uzun ve, wê bike ku em ji aliyên din ên bi heman awayî bi qîmet yan jî ji vî aliyî ji bi qîmettir yê vê berhemê bi dûr bikevin. Li vir tecrûbe û dengê Evdalî bi xwe metonum in ji bo deng û tecrûbeya Kurdan bi xwe. Ango navê Evdal tê hildan, lê îşaret bi kolektîfa koma Kurdan tê kirin. Bi rêya Evdalê Zeynikê ye ku îdîa tên kirin ji bo ku rabihurî bê cîbicîkirin û şîroveyeke jîrekane ji bo roja me ya îro tê kirin. Dengbejî weke rêûresmekê ye ku di heman demê de dîrokî ye jî, lewma jî mentiqê wê heye ku karakterê Evdalê Zeynikê, weke dengbêjekî navdar û kilamên wî weke şahid bên bikaranîn.

### Evdal û xweza li mekanekî bihuştî yê bênav

Ya duyem ku Mehmet Uzun bi rêya fîgurê sereke Evdalê Zeynikê dike ew e ku wî kariye îşaret bi xweza û erdnigariyê bike. Vegotina serpêhatiyê li mekan û peywendeke zozanî de hatiye danîn, li erdnîgariyeke gundewarî ya bihuştî ya ku lê deng û xweza (nexasim jî bi awayekî şênbertir hawîrdora akûstîk yan jî soundscape) yekdeng in; her yek ji wan hem dike yê din teşe bigire û hem jî yê din çêdike; ango her yek ji wan niçik yan jî dewama yê din e. Referans û îşaretpêkirinên yekser ji bo erdê bi xwe nînin. Lê belê dîsa jî babetek heye ku bi temamî di tevahiya berhemê de xwe dide der, nexasim dema ku îşaret bi estetîka Evdalê Zeynikê tê kirin. Ji serî heta binî di berhemê de babeteke xurt û bi belaxet îfadekirî şax berdane. Ew jî ew e ku dengê Evdal û xweza her yek in, yek ya din temam dike, niçikên hev in. Têkiliya ku Mehmet Uzun ava dike di navbera dengê Evdal û xwezayê de têra xwe baş hatiye vegotin û peywendiya Evdalê Zeynikê û xwezayê jî bi hawîrdora akûstîk re weke pirralî di vegotina romanê de hatiye avakirin. Heta carekê, stîl û estetîka Evdalê Zeynikê di nava hawîrdora akustîk a xwezayê bi xwe de hatiye verotin: "Sîpanê Xelatê bûbû gewriya wî, deşt bûbû devê wî, lehî bûbû dengê wî. Ew bêhed û bêhudûd, mezinbûbû."


### Evdal, dengê wî û hawîrdora akustîk a xwezayê


Weke encam, dengê Evdalê Zeynikê ne xerîbek e ji bo xwezayê, belê beşek ji wê ye; tim û daim di rewşeke ahengê de ye; ahengeke welê ku hêmanên acizker bi tevahî ango bi awayekî mutleq tê de nînin, ya heyî ferzkirinek e: "Gava dengê Evdalê Zeynikê li dengê av û bayê zêda bû, dengê Evdal bêdengiya dinê û hewirdorê xira nekir." Dengê Evdalê Zeynikê hawîrdora akustîk a xwezayê xirab nake, ew xwe li wê zêde dike, yan jî lê zêde dibe, û bi awayekî bêqisûr diherike nava wê û ji nava wê diherike derve. Dema ku Evdal kilaman dibêje, ya ku esas ew dike, ragihandina xwezayê ye. Hebûna wî û hebûna dengê wî ne serbixwe ne, lê belê ew niçik û dewama erdnîgarî û hawîrdorên akustîk ên li dewrûbera xwe ye: "Bi dengê wî çiya diheji, birûsk digurî, ava golên girtî û genî diherikî û pelên darên behîf û hinaran hêşîn dibû." Tevî ku bînaya çavê wî nîne, fera wan vemiriye, û yan jî belkî ji ber vê yekê bicihbûna Evdalê Zeynikê di nava xwezayê de xwe ferz kiriye di vegotina romanê de.

Ji ber vê yekê mirov dikare îdîa bike ku bi dengê Evdalê Zeynikê û bi peywendiyên wî yên pirralî bi xwezayê re dozek tê kirin ji erdnîgarî û bêdembûna wê. Evdalê Zeynikê û karakterên din di romanê de pahn û besît in, ew bi demê re bi pêş nakevin yan jî venaguherin karakterên girift û tevlîhev. Ev yek jî bi peywenda demê ya romanê re li hev dike ku tê de dem jî pahn û besît e. Ji bilî peyvên giştî yên ku kalbûnê îfade vedibêjin, ti hisa bihurîn û bipêşketina demê nîne. Li aliyekî karakter bi demê re zanetir, sofîstîketir nabin. Li aliyê din nebûna hiseke xurt a demê dike ku mekan bêdem bibe û daimî hebûna xwe mihafeze bike, ango her hebe. Li vê hisa pahnbûnê ew rastî zêde bûye ku dawî bi rengekî ji rengan di destpêka romanê de hatiye eşkere kirin, ji dest hatiye dayîn; mirov dikare pêş bibîne ka di vê beşê de wê çi biqewime.

### Demeke pahn û naherike

Herî dawî, ji ber ku dengbêjî beriya her tiştî rêûresmeke dîrokî ye, rêûresmeke wisa ye ku bûyerên rabihuriyê vedibêje bi rêya gelek cureyên cihê, bikaranîna vê rêûresmê bi vî awayî bi kêra wê yekê tê ku ew rabihurî bê vegerandin ku roja me ya îro bi pirranî nemaye, ji dest hatiye dayîn yan jî winda bûye. Serpêhatiya Evdalê Zeynikê struktur û avahiyên civakî yên Kurdan derdixe holê bi dilşahiyeke nostaljîk, bi rêze-peywendiyeke bê arîşe û kêşe ku tê de desthlat û xelkê ji 'amê di nava ahengeke bêqisûr de ne; û ev ahenga bêqisûr jî bi tênê dikare bê xirakirin bi destwerdana biyaniyan ji derve û li vir ev hêza xerîb jî Paşayên Osmanî ne. Sedem li vir dibe ku ew be ku Mehmet Uzun pêdivî bi wê yekê his kiribe ku bêhtir helbest û lîrîkê dabîn bike. Pirraniya caran, Uzun bi tenê çend rêzan ji kilamên Evdalî di vegotina xwe de bi cih dike.





Ew bi girîngî îşaretpêkirina bi "dengî" di romanê de mirov dikare rave bike, dema ku berê xwe bide peywenda siyasî ya salên 1990'î ya elaqedarî Kurdan. Hingê, wan salan dewleta Tirk hîna nû dest pê kiribû ku qedexeyên qanûnî yên li ber peyivîna Kurdî rake. Esas, roman îşaret bi vê rastiya tahl dike. Lê bi awayekî bêhtir şênber, dengekî weha yê Kurdan ê siyasî li Tirkiyeyê nebû, û her awayê beşadariyeke manedar a li jiyana siyasî ya Tirkiyeyê ji bo Kurdan tine bû. Ev serdem li Tirkiyeyê di heman demê de şahidiyê li destpêka peydebûna elaqeyeke ji bo bîr û dîrokê li cem komên cihê yên etnîk dike. Û nêzîkî li rabihuriyê dihatkirin bi beşdariye li deng û vegotinên cihê da ku bûyerên rabihuriyê bên ronîkirin; û ev deng û vegotin cihê bûn ji yên dewleta Tirk.

### Ne roman bi xwe lê peywenda tê de hatî nivîsîn serketinek bû

Bi giştî, weke serencamekê em dikarin bibêjin ku Mehmet Uzun bi awayekî serketî Evdalê Zeynikê li jiyanê vedigerîne bi vê berhema xwe ya wêjeyî, yan jî bi vê romana xwe. Karakterê Evdal bêhtir bi awayekî baş hatiye bikaranîn da ku wan mijar, babet û peyamên li jor behsa wan hat kirin, ragihîne. Niha mirov dikare îdîa bike ku Mehmet Uzun dikarî vê yekê û armanca xwe ya ji berhemê bi bikaranîna dengbêjekî din jî bi ser xista. Tişta ku Evdalê Zeynikê ji wan ên din vediqetîne hebûna wî ya mîtîk e, zindîbûnû rengîniya çîrokên wî, serpêhatiya wî ye û nexasim jî vegotina xurt a exlaqî ye ku di nava hemûyan re dibihure. Bi herhalî, bi ya min, serketina Mehmet Uzun di nivîsandina vê romanê de ji berhemê zêdetir di wê peywendê de ye ku wî berhema xwe tê de nivîsî. Dema ku mirov li ber çavan bigire ku rêûresmeke xurt a nivîsandina xeyalî (fîksiyon) di Kurmanciyê de, hingê mirov dikare bi hêsanî bibêje ku berhema Uzun, ev karê wî gaveke wêrek bûye. Vê yekê bi serê xwe nivîsandina fîksiyonê bi Kurdî teşwîq kir û bû alîkar ku rêya veguherandina ber bi zimanekî edebî ve vebe li ber Kurmanciyê yê ku dikare cureyê romanê bihewîne û adapte bike.

www.arsivakurd.org

# Ava Tî û heyînayetî




◆ 'Av' di vegotina Ahmedê Bilokî de xwedî nirxeke wateyê ya erênî ye. Lê 'tî'bûn bi nirxeke neyînî li avê serwer dibe. Bi vî awayî ji serî heta dawî 'tî'bûn di bîra me de dimîne û helbestvan jî her tim wê tîne bîra me. Ger ku av tî be, av kêm e. Ne temam e.

◆ 'Ava Tî' ji cehekî bi şûn ve dibe dirûşmeyeke di rihê jinê de, dibe taswîr, dibe pênase. Êdî mirov dikare giraniya sembolê bibîne, ku semboleke ji binehişiya civakî çawa li qeraxên binehişiya helbestvan xistiye. Di encamê de tîna avê dişike. Lê em wê nabînin.

**Erdogan EGRON***

Di demên dawî de, li gel zor û zehmetiyên pêvajoya siyasî ya em tê de ne, weşanên Aryen bi dilêrî û bi hişyariyê balê dikişîne ser xwe. Di hêla êdîtoryal de mora xwe li xebatên hêja dixe. Yek ji xebatên weşanxaneyê jî pirtûka 'Ava Tî' ya Ahmedê Bilokî ye. Bawerim ku ew ê di hêla edîtoriyê de bala pisporên vî karî bikişîne, lê belê di derbarê helbestê bi xwe de dixwazim çend gotinên kirdewar bînim ziman.

'Ava Tî' ji yek helbestên wî ye ku navê xwe li pirtûkê jî kiriye. Helbest bi rêbaza serbest hatiye nivîsandin. Helwêsta raveker, lêpirsînêr û cih cih wesfîner di nava hev de hatine bikaranîn. Bi dubarekirinan, bi dijberiya peyvan xwestiye rîtmekê bide helbestê û wateyên nû biafirîne.

Helbet di helbestê de wate, wateyeke zanistî nîne. Wate di helbestê de rabihîstînî ye, bîrbirînî ye. Ji bo vê yekê jî helbest navê pirwateyiyê ye. Pirwateyî bi peyvên hatiye giyanwerkirin, sembol û metaforên binehişiya civakî dikare were afirandin. Helbestvan encax dikare bi vî awayî helbestê ji binhişiya kesayetê rizgar bike û têrwateyî di helbesta wî de rû bide!

Helbest bi tenê ne bi tiştên hatiye gotin helbest e. Bi heman awayî ew bi tiştên ku venegotiye, peyvên ku li dervayî vegotinê hatine hiştin, helbest e.

### Heyînayetî û av

Di 'Ava Tî' de ev du xal jî balê dikişînin. Di 'Ava Tî' de behsa berxwedana duwanzdeh berxwederên li Şengalê nayê kirin lê em radibihîzin ku ew li wir in. Behsa zarokên ji ber şîr hatine girtin û terkî mirinê hatine kirin nake, lê li berpala Şengalê, li ber qêleya havîne em wan dibînin. Em şervanên jin û mêr tê de dibînin û her yek dibe bişirandinek û ruhê me yê kelogirî dinixûmîne. Ehmedê Blokî avê weke semboleke dewlemend, ku bingehê heyînayetiyê ye dixe esasê helbesta xwe û helbestê li ser av û tîbûnê ava dike. Av, avahî ye. Di zimanê me de wiha bi cih bûye; pakî, paqijî û ezîzî ye.

Di mîtolojiya Sumeran de heyînayetî ji avê dest pê dike. Hemî xweda ji avê diafirin. Av, dêxweda ye. Di mîtolojiya Babilan de dibe stergeha Mardûk ku mirov dibîne meyla Mardûk bi vî awayî li malzaroka dayîkê ye. Malzarok jî derya ye, av e, destpêka jiyana giyanwer e.

Di felsefeya xwezayê de cihê xwe di nava 'anasir-i erbaa' de digire. Di têgihiştina heyînayetiyê ya tasawûfê de heyînayetî weke çemekî tê dîtin. Çem ji jor ve (yanî ji heyînayetiya mutlaq) ber bi jêr ve dinilize. Ev çem encax di kesayeta xelîfeyê heyberan de (insan) dikare bixurice jor.

### Av ji pîroziya xwe dikeve

Axirê 'av' di vegotina Ahmedê Bilokî de xwedî nirxeke wateyê ya erênî ye. Lê 'tî'bûn bi nirxeke neyînî li avê serwer dibe. Bi vî awayî ji serî heta dawî 'tî'bûn di bîra me de dimîne û helbestvan jî her tim wê tîne bîra me. Ger ku av tî be, av kêm e. Ne temam e. Tîbûn tê wateya pêwistî bi tişta kêm di kesayetiya avê de. Bi vî awayî av ji pîroziya xwe dikeve. Ava heyatê, ava zemzemê, ava nemiriyê… Av êdî tî ye. Bi dijberiya 'av' û 'tî'bûnê wateyeke nû tê afirandin.

### Tîbûn dibe tîbûna keviran

Bi tîbûna avê prosesa heyînayetiyê di kesayeta civaka Ahmedê Bilokî de diqurife. Helbesta wî ya dirêj di navbera trajediya Şengalê û destana Kobanê de dibe pirek.

Ji tîbûna avê helbestvan jî pertav dikeve. Tîbûn tîbûna wî ye û tîna wî bi peyvan naşike. Ji bo wê jî gelek peyvan dubare dike, gelek qalibên hevokan diceribîne. Ji cihekî û pê ve jî helbesta xwe bi leylanan dinivîse. Tîbûna avê bûye tîbûna helbestê, ya helbestê bûye ya helbestvan, ya helbestvan dibe ya xwîner. Tew mirov qet lê hay nabe, tev ji ber xwe ve bê agahî… Û tîbûn dibe tîbûna keviran…

*'av tî dibe*
*lêvên keviran diqelişin*
*îskana meyperestan dilerize'*

Helbestvan, behremendiya keviran bi dev û lêvkirinê nîşan dide. Û ji tîna avê lêvê li wan dide qelaştin. Di kesandinê de behremendiyeke hêjayî wesifandinê ye û bi helbestê daye xwarin ku pirr zû bala me nakişîne. Ne bi tenê wateyê, xuyangê jî bi mijeke tenik dinixumîne. Jixwe kûrahiya helbestê jî dikare bi vî awayî were naskirin.

'Ava Tî' ji cehekî bi şûn ve dibe dirûşmeyeke di rihê jinê de, dibe taswîr, dibe pênase. Ji vir û şûn ve mirov dikare giraniya sembolê bibîne, ku semboleke ji binehişiya civakî çawa li qeraxên binehişiya helbestvan xistiye.

### Xwîner her tî dimîne

Di encamê de tîna avê dişine. Lê em wê nabînin. Çima, çawa, li ku û bi çi tîbûna avê dişike em lê serwext nabin. Belkî tercîheke, belkî pêwistiya qedandinê, belkî têgihandina helbestê ye. Lê xwezî mirov bizanîba bi çi û çawa tîna avê şikest. Gelo bi axê, bi hewayê yan bi êgir tîna avê şikest? An bi hêsirên dayîkekê, bi xwîna ciwanekî/ê tîna xwe şikand? Lê em bi rêzikên rûpela dawiyê têdigihêjin ku tîna avê şikestiye lê em her tî dimînin.

Wisa dibêje :

*'Xwestin dîsa*
*min û te vexwin*
*lê nekarîbûn*
*lê nekarîbûn*
*lew êdî pêsîrên te ne tazî bûn*
*ger careke din av*
*TÎ BIBE*
*û em carekê bibin*
*TÎWARÊN TE…'*

Piştî ku mirov wan rêzikan dixwîne xweziyek li mirovî peyda dibe û mirov bê hemdê xwe dibêje 'Xwezî wisa neqediyabûna'.

Helbesta Ahmedê Bilokî dişibe spîndarên berî li asîmanan û weza ber bayî xuşînî bi pelçimên dikeve; pelçim diricifin, diçirisin…

** Ji Girtîgeha Odemiş a Izmîrê*

www.arsivakurd.org

# Rondikên we radimûsim

Belkî ew çend kêlî ji bo wê bi qasî deh salên ku ji kurê xwe dûr maye dirêj bûn. Wê dihejmart ka rêya ku Seyîd Riza tê çend gav in. Li ser rûyê gerdûnê, ji bilî kurê wê her tişt tine bûbû û ne diyar bû. Di van çend gavan de ku dawiya wan nedihat çend mûyên spî li porê wê zêde bûbûn.

Dersim ZÊREVAN

Di nava çend kêliyan de, min digot qey dilê min nema di qefesa sînga min de hiltê. Her ku diçû diwerimî û mezin dibû. Lê dîsa jî ew di ber gotin, hest û rondikan re nedigiha. Ne gihiya ku hemûyan di kewara xwe de zeft bike. Ne gihiya ku hemûyan ji ber bike. Himêz bike û destê xwe di ser de bibe. Gelo dile min biçûk bûye an lewaz bûye? Di nava çend kêliyan de min dilê xwe di dadgeha wijdanê xwe de, da ber lêpirsînê, bê ka ev çi û ne çiye. Şaş fam nekin, lê min gelekî lome jê ne kir. Ji ber ku tabloya ku ez li beramberî wê sekinîbûm ji wê wêdetir bû ku dilê min hemû şifreyên wê çareser bikirina. Rastiya ku ez pêre rû bi rû hatibûm dayik bûn.

### Mêvanên me yên biharê

Berêvarê ye; piştî baraneke narîn, hêdî hêdî ewr kêm bûn û ez jî ji xwe re li ser girê jora wargeha me xayiz bûme. Li tava ku pirteqalî bûye û hêdî hêdî dixwaze biçe ava, temaşe dikim. Di wê navberê de çend heval hatin ji bo kîvarkan kom bikin. Ji xwe me hemûyan xwarina êvarî xwariye. Hîna min bersiv ji pirsa xwe re nedîtibû hevalan gotin, "Du malbat hatine mêvandariya me". Mêvanên me jî mirovên hevala Şevîn in. Yek ji wan malbata şehîd Avareş e ya din jî malbata hevalê Seyid Riza ye.

Di sala 2012 de dema ku Seyîd Riza ji bo hemleya şerê şoreşgerî derbasî Şemzînanê dibû, min li ser rê wî dîtibû. Sohbeteke me ya kurt çêbibû. Ciwanekî jîr, wêrek û qederekê jî ji xwe razî bû. Ji xwe razî bû, ji ber ku di Dibistana Perwerdeya Apollo ya Fermandariyê de sê stêrk girtibûn. Ango tê wateya piwanên herî bilind. Her çiqas ku gerîla bi dilnizmbûna xwe bêne nasîn jî, lê ya Seyîd Riza ji ber temenê ciwaniyê, nav û navnîşana fermandarê bi sê stêrk, ji xwe razîbûneke li hevhatî lê zêde kiribû. Piştî demeke li ser Hemleya Şerê Gel yê Şoreşgerî re derbas bû, navê gerîla Avareş ku bi kesayeta xwe ya leheng, bi jiyana xwe ya kelecanî, fedekar û şehadeta xwe ya egîdî şopeke mezin li ser hevalên xwe hiştibû, li çiya vedida. Hingî min rastiya kesayeta wî ji hevalên wî bihîstibû, mîna ku ez bi salan pê re mabim, dinasim. Belkî jî hin caran ji bo mirov hevûdu binase, dîtin ewqas gîrîng nabe. Ji xwe ji bo jiyan û hevaltiya gerîla qet nabe. Pêngava şerê şoreşgerî bi serketineke ku mora xwe li dîroka gelê Kurd daye bi dawî bû. Bi qasî şahiya serketina vê berxwedanê, êşa cangoriya jî ne kêm bû. Belê, her tişt di vê jiyanê de du aliye. Bi qasî ku nîvê mirov ji êşê dişewitîne, nîvê din jî bi rûmeta wê, te hênik dike. Mirov bi hêbûna van herdu dijberbûna dikare bêje ku ez heme.

Di vê jiyanê de, nixasim li serê van çiyan tiştek ji xwe berê nabe, misoger nîşana tiştekî veşartiye. Disekine, radiweste li benda hatina kêliya xwe dimîne. Piştî salekê di sibeheke biharê de min Seyîd Riza di goristana şehîdan de li ber goristana şehîd Avareş sekinîbû, dît. Di vê êvara biharê de jî em dayik û bavê herdu hevrêyan bi hev re pêşwazî dikin. Malbatek jê hatiye lawê xwe bibîne, ya din jî hatiye tirba wî bibîne. Yek dijî, yek jî şehîd e. Bi hev re li kêleka hev rûniştine. Di kêliyên wiha de nabe ku mirov ji dualîbûna wiha re nebêje ku bê edalet e. Ji ber ku ev dualîteya ku em behsa wê dikin xwe dispêre zihniyeteke deshilatdar û dagirker. Lewra ji adaleta gerdûnê biyanî bûye û dualîteya wê ya xwezayî jî înkarbûyî ye.

### Di çavên wî de rengê bihuştê

Avareş navê xwe ji gerîlayekî girtiye. Di zarokatiya xwe de wî dibîne, nas dike û pir jê bandor dibe. Paşê ew gerîla şehîd dikeve û Avareş navê wî gerîlayî radike û tê serê çiya. Ji bo em behsa Avareş bikin ti pesn hewce nake. Tenê li bîbikê çavê vî lawikê welatê çiya temaşe bikin, hûnê karibin bi rehetî rengê buhiştê, di çavê wî de bibînin. Hûriyê welatê dayikê, welatê Kurdistanê ye. Zerdexena li ser rûyê wî, bi wan çavên xwe yên keskî biharî, behsa evîneke abidîn li ser axa welatê xwe dike. Ew jî mîna her hevalekî xwe bi bayê eşqa dozeke giran sermest bûye. Bi rojê re dildar, bi stêrka sibê re hişyar e. De bes e hevalno!… Bese wî bi tiliya nîşanî hev bidin. Bi nêrînê dilê xwe wî çavînî nekin! Wê sûrişt û xwedawend bihesidin, wê wî bibin û tevlî refê xwe bikin. Wê bêjin bila asîmanê me bi rûbihiştekî wisa xweşik bi şewqtir bibe. Ma di raboriya me de destanê wisa ne gelek in? Li hev kom bibin hevalno da ku em Avareş di sedefa dilê xwe de veşêrin. Da ku kes wî ji me ne dize.

Seyîd Riza hîna jî li ber kêleka Avareş sekiniye, rûpelê çîrokên lehengên Şemzînan, di çavên wî de diqulipin. Ezmûnê jiyanê wî dilnizm kiriye, tav û bayê zozanê Şemzînanê esmerbûna wî tarîtir kiriye. Îdî Seyid dizane ku çend serketin têrê nake ku stêrkên wî biçirisîne, ya pêwîst ew e ku berê xwe bide asoyê herî bilind ya vê jiyanê û ji wir ve stêrka xwe bi destê xwe di nava stêrkan de bi cih bike. Ji ber ku her tişt li cih û bi wateya xwe xweşik e.

Hemû hevalên wargeha me di nava kelecaneke mezin de ne. Da ku di erkê mêvanperweriyê de qisûr nekin. Dibe ku mirovên hevala Şevîn bin, lê di heman demê de dayik û bavên hevalên me ne. Ango dayik û bavên me ne jî. Şeva me bi guhdarkirina dayik û bavan geş bibû. Hesretê salên ku dûrî zarokê xwe jiyan kirine, bilêv dikirin. Geh behsa bîranînên zarokatiyên wan dikirin, carinan jî yên dema ciwaniya wan. Carinan em bi xwe re dikenandin, carinan jî digiriyandin. Şev zû, zû derbas bû.

### Hesreta bi salan…

Ber destê sibehê Seyîd Riza û hevalekî xwe yê gerîla ber wargeha me ve dihatin. Dayik û bavê ku bûye deh sal kurê xwe nedîtine nema erdê ew digirtin. Dayika ku ji dûr ve kurê wê ku hêdî, hêdî nêzî dibû dît, xwe ji destê me filitand û ber bi kurê xwe ve baz da. Tirsa hemû hevalan ew bû ku tiştek ji dayikê bê, yan jî dilê wê barê vê kêfê raneke. Heval pê ve gihan û ew dane sekinandin. Di wê navberê de ew aram jî dikirin da ku wê matmayîbûnê ji ser xwe bavêje. Piştî ku dîtin ti çare di destê wê de nîne, sekinî û li benda hatina wî ma. Belkî ew çend kêlî ji bo wî bi qasî deh salên ku ji kurê xwe dûr maye dirêj bûn. Çavê xwe miç nedikir da ku çirkek be jî dîtina kurê xwe hedir neke. Ji dîtina wî û şûn de wê dihejmart ka rêya ku Seyîd Riza tê çend gav in. Li ser rûyê gerdûnê, ji bilî kurê wê her tişt tine bûbû û ne diyar bû. Di van çend gavan de ku dawiya wan nedihat çend mûyên spî li porê wê zêde bûbûn. Xwîna canê wê hemû hatibû di lamên rûyê wê de kom bûbû. Jixwe, dilê wê jî bi lez lê dida û canê wê mîna pelê darekê dihejand. Kamêreya min ku bûbû şahidê van kêliyan bi qasî dilê min, zîz bûbû. Û ew kêliya bê terîf hat…



### Bila çûyin ti carî neba

Di wan kêliyên ku malbata Seyîd Riza bi dîtina kurê xwe şa dibûn, malbata Avareş ketibû bihuşta stêrkan. Ketibûn welatê stêrkan. Dayik û bav bi derbasbûna xwe re awirê xwe di nava bêdengiyê de digerandin. Dayika ku kelê hêdî hêdî zora hestê wê dibir, bi gavên giran li Avareşê xwe digeriya… Ti biçûk bû delalê min lê niha ti mezin bû ye, lê dîsa jî ezê ji wî çavên te yê biharî, ji wî kenê te yê nîsanî, û ji wê bêhna te ya emberî nas bikim. Ma pepûleyan xebera hatina min ji te re nanîbûn? De rabe delalê min ber bi min ve were. Were pêl çîmenê dilê diya xwe bike bi wan lingên nazik. Were rêya veqetînê dirêj bû, ez tî me, tene ava evîna hestên te yê kewserî tîna min wê bişkîne. Delalê min, govenda we dirêj û fire ye, lê hevalê te dibêjin tu ser çopî yî. Lê nesekine, ezê dîsa jî bigihime te. Li min negire delalê min, ji ber ku dil û çavên min weke fincana xwînê lê hatine. Ez dayik im, lê ez ewqasî jî ji te razî me. Kurê min bila çûyin ti carî nînba, bila wê gavê ev giyana dayika te di dara bişengê de ba, da ku bisk û şaxikên wê li ber bayê hênik bi ser bejn û bala te re biriba û bihata.

Her çiqas dil û cergê wan li vir mabe jî, mêvanên me ber û warê xwe ve bi rê ketin û çûn. Ango rêkên berdewamkirina jiyana xwe ji hev cuda bû. Lê armancên me yên azadiyê ti carî ji hev cuda nabe. Lewma diyar e ku hemû dualîbûn ji dijberbûnê pêk nayê. Dualibûna hişk a ku ji zanebûna gerdûnî qut, ji dijminahî û dijminbûnê pêk tê.



Dibên – Xudê rehme
Û me tirê Xudê
Wê bê hewara me.

Kurdo, xwe ra here,
Ber kul û derdê te
Rebê jorin kerr e.

(Mîkaîlê Reşîd)

www.arsivakurd.org